


Kurd êdî bi girîngiya stratejîk a welatê xwe hesiyane




erjewendiyên dewleta tirk bi xwe jî pêwîstiya çareserîya kêşeya kurd dide pêş. Niha qedera xeta petrolê bi kêşeya kurd û PKK'ê ve hatiye girêdan. Mirov nikare berî faktora PKK'ê li ser xeta petrolê bifikre û projeyan çêke. Esas çareserîya kêşeya kurd ne tenê ji bo xeta petrolê, jî gelek aliyan ve pêdivî bi çareseriyê heye. Berê împeryalîstan kêşeya kurd, wekî çekeke dîplomasiya veşarî didît. Lê êdî ew serdem li paş ma. Kurdan di enca ma têkoşîneke dûvedirêj de xwe jî "objebûna" dîplomasiya veşarî rizgar kir. Êdî dem dema subjebûneke çalak e. (R .3)

Mifteya petrolê

di destê kurdan de ye

Azadiya WELAT



SAMI TAN

Ku ji kîjan alî dengek bo çareseriya kêşeya kurd bilind dibe, rayedarên tirk şûrê xwe dikişînin êrîşî wî alî dikin. Ev yek dê serê gelê tirk jî bixe belayeke mezin.

Gefxwarin û belakirî ne çareserî ye

Heftaya çûyî bi şewitîna daristanê li çarmedorên Stenbolê, agir bi dawa hinekan ket. Hinek keskarêz sexte rondik ji çavên xwe dibarandin û digotin: "Agir bi kezeba me ket, êdî bes e!" Diyar bû ku agir jixweber bi daristanan nediket, ew kar bi destê hinekan pêk dihat. Di vî warî dîtina hevpar wekî bikirê vî karî mafyayê nişan dide. Bi piranî hate gotin ku ji bo vekirina cihê xaniyên qaçax, ev daristan tene şewitandin. Bi trîliyonaan pere di vî karî de heye, lewre jî çete van daristanan didin şewitandin.

Di vê bûyerê aliyekî balkêş jî helwesta keskarêzên qaşo ye. Ji daxuyaniyên wan diyar dibe ku, ew keskahiyê di ser jiyana mirovan re digirin. Lewre jî bêyî ku li jiyana mirovan bifikirin dibêjin: "Divê cezayê bikirên vî karî darvekirin be."

Di bin helwesta keskarêzên qaşo de durûtiyeke mezin jî heye. Piştî destpêkirina wan bûyeran bi rojekê di rûpela dawîn a Ûlkede Gündemê digel dîmenên daristana şewitî yê Beykozê,

dîmenê daristanên li gelek cihên Kurdistanê jî cih digirt, ku bi destê leşkerên tirk bi qestî hatine şewitandin. Lê tu kesên keskarêz bala xwe neda wan dîmenan. Heta roja îro wan keskarêzên qaşo li ser keskahiya Kurdistanê tiştê nekiriye û daxuyaniyek jî nedane.

Ligel ku PKK'ê agirbest îlan kiriye û gerîla li hemberî hemû provokasyonên hêzên dewleta tirk xwe jî pozberiyên didin alî jî, şûrkêşên dewletê dîsa xwestin ku vê bûyerê bixin stûyê PKK'ê.

Provokasyonên giregirên dewleta tirk van rojan gelekî zêde bûne. Bo nimûne Fermandarê Hêzên Bejî yê Artêşa Tirk Atilla Ateş gefan li Suriyeyê dixwe û bi devçepelî çelî Serokê Giştî yê PKK'ê dike.

Ji gotinên Ateş tengavbûna dewleta tirk diyar dibe, jixwe ew jî dibêje: "Êdî sebra me nemaye." Xuya ye ku şer bêhna dewleta tirk diçikîne, hestên şovenîst û berjewendiyên mijokî re nadin ku ew bîn ser rîya aşî û biratiyê lewre jî didin ser rîya çareseriyên zir.

Heke li ser vê rîyê dimeşin dibe ku êrîş bibin ser dewletên cîran jî.

Ku ji kîjan alî dengek bo çareseriya kêşeya kurd bilind dibe, rayedarên tirk şûrê xwe dikişînin êrîşî wî alî dikin; Libya, Rûsya, Ewropa bo wan tu fêrq tune. Heta mirov dikare bibêje ku Libya hinekî nêzik bûya, dê piştî qewimînên dawîn dewleta tirk yekser êrîş bibira ser vê dewletê. Lewre Serokê Libyayê Qadafî jî mêt ve piştewaniya xwe bo dewleteke kurdan diyar kiriye. Ew bi vê yekê jî nema, PKK bi awayekî fermî vexwendê pîrozbahiyên salvegêra şoreşa Libyayê. Li ser vê yekê çav li serê rayedarên tirk sor bûn, daxuyaniyên tûj dan çapemeniyê û ji Libyayê dîplomaten xwe vekîşandin.

Ji van mînakên jî diyar dibe ku ev rê ne tu rê ye û dê belayên mezin bîne serê gelê tirk. Lê mixabin gelê tirk hê jî dîtina vê rastiyê durr xuya dikin. A rast gelek kesî pir hindik rastî fêm kiriye, lê kesî ku wan bi rêxistin bike û wan li dijî dagirkeran rake ser piyan xuya nake.

Kursên kurdî û perwerdehiya neteweyî

Ferhengok

amûr: navgîn, alet
arastekirin: yonelmek
ast: teng, sewiye
bafon: alüminyum
berbiçav: şênber (somut)
bergeş: sifre
bijûn: adan (verimli)
bikir: kiryar, faîl
biyanistan: henderan, xeribî
bextewar: mutlu
cudaxwazî: bölücü
çewisandin: baskî
çêj: tam
çêjdar: tamdar
daw: eteklik
demsalî: mevsimlik
derfet: imkan
derşo: paçikê firaqan
derûnî: psikolojik
erjeng: tirsnak (korkunç)
erk: rol, işlev
fermî: resmî
gefxwarin: hereşe, tehdît
gels: arîşe, problem
geşedan: kemilîn, pêşketin, stewîn
giştîname: genelge

gopîk: lûtke, zîrve
gûstêrk: ateşböceği
gûlik: yabani pîrasa
hewisîn: hînbûn, fêrbûn
hincet: bahane
kêşe: arîşe, mesele ko: hambêz; çiya
necar: çêkerê tîştên darînî û hesinî
lênûsk: defter
mirêk: neynik, awêne
misoger: dabîn, garan-tî
nasname: kimlik kartî
nasnav: ulusal ve dini vb.kimlik
sergîn: tepik; zivil (tezek)
pêjinkar: hesas (duyarlı)
pêpeskirin: binpêkirin
pişaftin: asimilasyon
pozberî: berberî, nakokî
raydan: nişan dan
rêbaz: azîne, metod
têkûz: bêkêmasî, tam
vîn: îrade
zagon: qanûn
zanyar: bilimadamı

Zimanê zikmakî ne tenê amûra axaftin, fikirin, pêşveçûn û xweifadekirinê ye. Her wiha jî hêmaneke bingehîn a nasnava neteweyî ye. Zimanê her gelî şeweyê rabûn û rûniştin, giyanê neteweyî û xisletên bingehîn ên wî gelî di nava xwe de dihevine. Lewre jî xwe derbirina bi zimaneke biyanî jî bê çêj û tam e.

Ji ber vê yekê jî, dagirker ji bo pişaftina gelekî pêşî berê xwe didin zimanê wî. Nimûneya herî berbiçav di vî warî de politîkayên pişafkar ên li ser zimanê kurdî ne.

Lê divê bê gotin ku gel, bi berxwedana xwe dikarin van politîkayên hêzên dewletê bi avê de bibin. Di vî warî de jî rewşa gelê kurd mînaka herî balkêş e. Piştî ev qas asimilasyona li ser zimanê zikmakî yê gelê kurd jî, çand û zimanê kurd bi awayekî xurt li ser piyan maye. Her wiha bi geşedana tevgera azadîxwaz re hestên neteweyî jî bilind bûne û van salên dawîn di nav vî gelî de hewldanên ji bo hînbûn, xwendin û nivîsandinê pirtir bûne.

Lê dema mirov gavên ku di vî warî de hatine avêtin, bide ber gavên siyasî, dê bê dîtin ku ew xebat gelekî durrî daxwazê ne. Saziyên neteweyî li Kurdistan û metropolan li gorî zanîna û karîna xwe kursên zimên da-

ne destpêkirin, lê di vî warî de bêtêrûbetî û amatorî bi awayekî zelal balê dikişin. Kesên ku beşdarî van dersan dibin, her çiqas bi girîngiya hînbûn û bikaranîna zimanê zikmakî gihiştibin jî gelek xeletî û amatorî di nêzîktêdayînên wan de tene dîtin. Wekî mînak kursên ku di serî de bi panzdeh kesan dest pê kir, hêdî hêdî hejmara wê daket deh, pênc, çar he-

Gava ku mirov van xebatan wekî destpêka dibistanên kurdî binirxîne, pêdiviya xwerexnekirin û xwenûkirinê derdikeve pêş. Çimkî wê mamosteyên zimên ên sibê jî van saziyan derkevin.

ta du kesan. Hin caran saeta dersê tê jibîrkirin, hin caran ders bi temamî tê jibîrkirin. Ligel pir hişyarkirinê pir caran pêdiviyên dersê wekî pênûs û lênûsk tene jibîrkirin. Şagirt wekî ku herin seyranê diçin dersê, her wiha mijarên ku li ser tê rawestandin di cihê xwe de dimîne. Şagirt heta derseke din qet devê pirtûk û lênûska xwe venakin.

Li aliyê din kesên ku kursan didin jî ji asta ku ji mamosteyekî tê xwestin, durr in. Ew jî berî dersê xwe ji dersê re amade nakin. Lewre jî di vegotina mijarê de dikevin tengasiyê.

Dema nikaribin bersiva şagirtan bidin baweriya şagirtan bi wan namîne. Her wiha ew jî bi zanîna û tevgerîna xwe bigirin bin bandora xwe, dîsîplineke baş bimeşin.

Li aliyê din helwesta rêveberiya saziyan jî durrî nêzîktêdayîn û tevgerîna saziyên perwerdehiyê ye. Bî taybetî di kursên ku li avahiyên HA-DEP'ê tene dayîn de hin caran rayedarên HA-DEP'ê pêjinkariyê ke pêwîst nişan nadin, berevajî vê yekê karê dersdayîna cidî nagirin, jerasriyê dikin.

Gava ku mirov van xebatan wekî destpêka dibistanên kurdî yan pêvajoya ber bi dewletbûnê ve binirxîne, pêdiviya xwerexnekirin û xwenûkirinê derdikeve pêş. Çimkî wê mamosteyên zimên ên sibê jî van saziyan derkevin. Lewre jî divê her mirov di vê mijarê de jî jî dil bi disiplinî tevbigere.

Wekî ku Serokatîyê gotiye: "Gelê kurd birinç serê çiyayan, kirine şkeftan, têtikîyên wan bi mirovan re hatine qutkirin. Mirovên ku li şkeftan bimîne wê çawa mêjiyê wan bi pêş bikeve."

Divê bi vê zanebûnê em li xwendin û nivîsandina bi zimanê zikmakî vegevin. Bixwînin, binivîsin, bidin xwendin, bidin nivîsandin.

S. BERBEYAN- EVÎN RONÎ

Kurd êdî bi girîngiya stratejîk a welatê xwe hesiyane

Mifteya petrolê di destê kurdan de ye

"Îsrail wekî eyaleteke DYA'yê ye. Tirkîyeyê jî cihê rêveberiya Şahê Îranê girtiye. Li Rojhilata Navîn di navbera dewletên li herêmê yên din de jî hinek îtîfaq pêk tên. Di nav wan de PKK xwedî rolekê ye. Îradeya Filistîniyan hatiye dizîn, lewre li herêmê bi tenê PKK hêzeke muxalîf e û dikare lîstikên împeryalîstan derxe valahiyê."

Qewmînên dawîn ên li Rojhilata Navîn bandorê li hevkeşeya herêmê jî dike. Li aliyekî îtîfaqên ku di navbera Tirkîyê û Îsrailê de pêk tên, li aliyê din jî îtîfaqa di navbera dewletên wekî Îran, Ermenîstan û Yewnanîstan de. Dîsa girîngtirîn rûdan girêdana peymanê xeta petrolê ye. Wekî tê zanîn ev her du mijar bo kurdan gelekî girîng in. Îtîfaqa ku li dijî îtîfaqa Tirkîyê û Îsrailê, jî aliyê Yewnanîstan, Ermenîstan û Îranê ve tê sazîkirin çiqasî dikare gelên bindest ji êrîşan biparêze. Ji aliyê din ve dê ev îtîfaq PKK'ê yanî îradeya kurd nas bike an na? Digel wê yekê wê agirbesta PKK'ê çî bandorê li ser xeta petrolê û li ser îtîfaqan bike?

Helwesta PKK'ê girîng e


Li gorî Koordînatore AIOC Tamam Bayatly xeta petrolê li ser sê opsiyanan kar dike. A yekemîn ji Bakûyê wê biçe lîmana Novorossiisk a ku li ber qêraxa Behra Reş aliyê Rûsyayê ye. A duyemîn jî ji Bakûyê dê biçe lîmana Supsa ya ku li Behra Reş dikeve aliyê Gurcîstanê ye. Xeta sêyemîn jî wê ji Bakûyê biçe lîmana Ceyhanê ku girêdayî Edeneya Tirkîyeyê ye. Bayatly diyar dike ku, dema mirov hinek pîvanên aborî li ber çav bigire, xeta ku diçe Tirkîyeyê hem pir dirêj e hem jî lêçûnên wê zêde ne. Bayatly daxuyand ku, ew di warê xetê de gelekî xesas in. Ew ê li ser bi ewlebûna xetê ya ku di Tirkîyeyê re derbas dibe rawestî. Her wiha ew dê li ser daxuyaniya PKK'ê ya bi rengê 'Heta kêşeya kurd neyê çareserîkirin em destûra xeta petrolê nadin' jî bi awayekî hûrbînî

bisekinin.

Wekî din, ji aliyê rojnameyên tirkan ve gotinek di van demên dawîn de xwe dide pêş "Kürt Karti." Bêgûman piştî ku agirbest ji aliyê gelek dewletan ve bi awayekî erênî hate nixandî û piştgiriya agirbestê hate kirin, ev gotin hate bikaranîn. Wekî mînak nivîskara Hürriyetê Ferayî Tunç di quncikê xwe de li ser xeta petrolê û girîngiya "Karta Kurd" a di dema niha de bi van gotinan sekinîbû: "Li gel qeyrana aborî ya ku Rûsya di nav de bû, Dumayê ji bo piştgiriya PKK'ê biryara bangê ya li NY' stand. Gelo di bin standina vê biryarê de çî hebû? Bersiva vê yekê di hejmara rojnameya Commercant Rûs a di roja 7'ê gelawêjê de ye. Di wê hejmarê de bi ser navê 'Kurd ji bo têkoşîna xeta boriyê xwe amade dikin' nûçeyek hatiye çêkirin û tê de cih dane daxuyaniya Mahir Welat. Wî gotiye, 'ji bo ku em li ber xeta petrolê nebin asteng DYA'yê got em ê bo we piştgiriya aborî bikin, lê em piştgiriya siyasî dixwazin. Eger Rûsya piştgiriya siyasî bike, em destûrê nadin xeta Bakû-Ceyhanê.' Di vê demê de Karta Kurd bi hawara Rûsyayê de diçe."

Îsrail bûye eyaleke DYA'yê

Li ser xeta petrolê û rûdanên dawîn ên li Rojhilata Navîn, îtîfaqa Tirkîyê û Îsrailê em bi nivîskar û lêkolîner Fikret Başkaya re axivîn. Başkaya di daxuyaniya xwe de ev nixandî kir: "Îsrail wekî eyaleteke DYA'yê ye. Piştî cuntaya 12 yê rêzbera 1980'an Tirkîyeyê jî cihê rêveberiya Şahê Îranê girtiye. Di rewşa îroyîn de Urdina Hüseyin jî xistine nav xwe û eniyê leşkerî çêkirine. Lê belê Urdina Qral Hüseyin ne bes e. Armanca wan ev e ku Misirê jî tevî xwe bikin. Her dem diqirin û dibêjin: 'Ev îtîfaq ne li dijî tu kesî ango dewletê ye.' Ev kê dixapînin. Îtîfaqeke leşkerî wê bê danîn, lê wê tu dewletê, ji xwe re neke hedef. Ev tiştêkî ehmeqî ye." Ji aliyê din ve Başkaya li ser îtîfaqên din jî daxuyand ku, li Rojhilata Navîn di navbera dewletên din ên li herêmê de jî hinek îtîfaq pêk tên. Di nav wan de PKK xwedî rolekê ye. Îradeya Filistîniyan hatiye dizîn, lewre li herêmê bi tenê PKK hêzeke muxalîf e û dikare lîstikên emperyalîstan tîk bike.



Di domahîka axaftina xwe de Başkaya wiha got: "Lê belê dema ku PKK jî bi tenê bimîne di hin waran de dibe ku nebe hêzeke diyarker. Lê belê di konjoktureke wiha de bi îtîfaqa hezên antikapîtalîst, antiemperyalîst û antikomprador dibe ku lîstikên împeryalîstan tîk biçin." Nivîskar û lêkolîner Fikret Başkaya li ser agirbest, nêzîkedayîna Rûsyayê ya bo agirbestê û li ser barkirina petrola Hazarê jî dîtî û ramanên xwe bi van gotinan anîn zimên: "Berjewendiyên dewleta tirk bi xwe jî pêwîstiya çareserîya kêşeya kurd dide pêş. Niha qedera xeta petrolê bi kêşeya kurd û PKK'ê ve hatiye girêdan. Mirov nikare bêyî faktora PKK'ê li ser xeta petrolê bifikre û projeyan çêke. Esas çareserîya kêşeya kurd ne tenê ji bo xeta petrolê, ji gelek aliyên ve pêwîst e."

Başkaya li ser agirbestê jî got ku heta niha çî hatibe gotin, îro jî ew tiştên gotin. Wekî helwesta "wê hertîşt wekî berê bido-me." Yanî wekî ku tiştêkî nû nîn be tevdiagerin." Başkaya li ser Rûsyayê jî daxuyand ku, Rûsya dixwaze li herêmê xwe karîgertir bike, lê wê carê jî bi problemên navxweyî dest û piyên wê dikevin nav hevûdin. Doç. Dr. Fikret Başkaya da zanîn ku agirbest ji aliyê Rûsya û gelek dewletan ve baş hate dîtî, lê ji wan dewletan yekê jî dev ji nêzîkedayînen xwe yê klasîk ku wekî kevneşopiyekê ye berne-daye. Wî got: "Berê împeryalîstan kêşeya kurd, wekî kêşeya "Diplomasiya veşarî" didît. Lê êdî ew serdem li paş maye. Kurdan di encama têkoşîneke dûve dirêj de xwe ji "objebûn" a diplomesiya veşarî rizgar kir. Êdî dem dema subjektîvneke çalak e. Di pêşerojê de wê kêşeya

ya kurd bêhtir bikeve rojeva cîhanê. Di serî de KT, dûre jî hêzên metînger û împeryalîst nedixwestin ku wê yekê bibînin. Heta niha yê ku nedixwestin navê wî gelî bi lêv bikin, di demeke kin de teqez dê mecbûr bimînin ku navê wî gelî bînin ser zimên. Lewre dawîya înkarkirîna û tune hesibandîna nîn e."

Eniyêke anti-komprador pêwîst e

Başkaya piştî van daxuyaniyên balkêş pirsar me ya der barê gotina "Karta Kurd" de ku rojnameyên tirkan bi kar tînin ji nixandî û di dirêjahiya axaftina xwe de wiha got: "Belkî kurdan ji ber taybetmendiya xwezaya xwe, ji dîrokê vir de kartên di destê xwe baş bi kar neanîn. Serokatîyên kurdan heya îro jî girîngiya cografîya welatê xwe haydar nebûne û derfetên li ber destê xwe baş bi kar neanîne. Lê PKK bi vê yekê hesiyaye û bûye tevgereke rastîn a politîk. Îro hê jî hêzên li herêmê aligirê îtîfaqên împeryalîst û kompradoran in. Lê ev nayê wê wateyê ku desthilatdarî di destê wan de ye. Ji bo ku mirov bikaribe vê hevkeşeyê biguherîne, di zûtirîn katê de divê îtîfaqa hêzên antiîmperyalîst, anti-komprador bê çêkirin. Di nav îtîfaqê bi vî rengî de em dikarin bibêjin ku dê karta kurdan bikêrtir be. Ne durist e ku bi tenê kurd li dijî pergala nû ya cîhanê şer bikin û berdêlan bidin. Çi dibe bila bibe. Têkoşînen ji bo azadiyê tîk naçin. Lewre her bîsteke têkoşîna azadîbûn e. Eger wê diwarojeke mirovahiyê hebe, wê bi saya kesên ku ji bo rûmeta xwe, jî bo azadiya xwe û ji bo mirovahiyê şer dikin be."

AZAD ALTUN



Fikret Başkaya

“Dema sekinandina bi çek-kirina rejîmên sîtemkar e”

Ev nivîsa li ser bazirganiya çekan roja 30'yê gelawêja 1998'an di rojnâmeya Los Angeles Times'ê de hate weşandin. Nivîs ji hêla Endamê lêkolîn û lêpîrsînê William D. Hartung û lêkolînerê Înstîtûya Polîtîkaya Navneteweyî ya Zanîngeha Nû ya New York Erica Weinberg ve hatiye nivîsandin û WIJ-DAN DÊRIKÎ li zimanê kurdî wergerandiye. Di nivîsê de li ser mijareke girîng hatiye rawestandî, lewre jî me ew hêjayî weşandinê dit.

Di vê hevî de, wê kongreyek li dar bikeve. Dê çend rojan de, qanûnên awayê firotina çekan di cihanê de bê gengeşîkirin. Di vê kongreyê de dê li ser kes û dewletên ku zagonên li ser bazirganiya çekan binpê dikin bê rawestandî. Her wiha dê berbandkirina guhestin û şandina çekên Amerîkayê bo dewletên ne demokratîk bê xwestin. Ji ber ku di sala 1990'î de ji sedî 80'yê çekên Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê (DYA) ji hêla dewletên Cîhana Sêyemîn û rejîmên dagir û sîtemkar ve hatine kirîn.

Ev guftûgo rastî demêke pir guncaw hat, lewre xwediyên febrîkayên çekan ên mezin, yên wekî Lock Head Martin, Textron-Bell pê didin ser dewletê da ku rê bidin wan ku ew karibin çekên xwe bifiroşin dewleta tirk. Wekî tê zanîn ew dewlet di warê binpêkirina mafên mirovan de di rêza pêşin de ye.

Desthilatdariya Tirkîyeyê li dijî gelê Kurdistanê çekên giran bi kar fîne. Dixwaze bi çekên ku DYA'yê danê PKK'ê ji navê rake. Dewleta tirk Ji sedî 80'yê çekên xwe yên giran ku bi wan 3000 gundên kurdan şewitandin û valakirin ji DYA'yê distîne. Her wiha di van demên dawî de dewleta tirk rojnameger Ragîb Duran ji ber hin ramanên wî yên derbarê kurdan de avête girtîgehê.

Nimûneyeke din: Tê hêvîkirin ku DYA her du çekên xwe yên giran Tekstiron Bill “Kobra padîşah” û Boeng balafirên cengê yên nû bide Tirkîyeyê û bi buhayê çar milyar dolarî zêdetirî 145 helikopterên êrişê yên nû bifiroşe Tirkîyeyê.

Di qanûna borî de girseya li dijî siyaseta rêveberiya Clinton, rêveberiya DYA peymanek girêda da ku hinartina çekên tekstron û boeng (helikopter û balafirên êrişê) ji komara tirk re. Lê di sala 1996'an de rêveberiya DYA'yê hinardeya helikopterên super bo Tirkîyeyê red kiribû. Ji ber ku di warê mafên mirovan de navekî xerab li ser Tirkîyeyê ye.

Piraniya serokên siyasî yên dijberê rêveberiya Clinton xwediyê berjewendi-



yên bazirganî ne. Her di sermaweza borî de yên ku çekên giran hilberandin ev bûn: Boeing, Textron, General Electric, Lockheed Martin û North Gurman, hilberînerên çekan bi xwe piştevanê Partiya Demokrat in. Wan kesan nameyek şandibû ji Clinton re da ku ew rîya firotina helikopterên kopra jî veke. Ango lîsansê bide şirketên ku dixwazin van helikopteran bifiroşin Tirkîyeyê.

Bi vî awayî rêveberiya Clinton hewl da ku rêxistinên mafên mirovan bédeng bike û wan qanî bike ku çekên ku vê dawiyê firotine Tirkîyeyê dê ji bilî mercên dijwar neyê bikaranîn. Di naveroka peymanê de şert wiha êşkere dibin: Divê firoke neyê bikaranîn ji bilî cenga bi welatekî din re, her wiha divê li gorî qanûnên şer bêne sazîkirin, pêkanîna sîstema demokratîk, divê dewleta tirk li Kurdistanê ji rewşa awarte derkeve. Lê mixabin, ne gengaz e ku Tirkîye van her sê daxwazan bi cih bîne.

Rêveberiya DYA'yê li ser rewşa mafên mirovan a Tirkîyeyê raporek daxu-

yand, li gorî vê raporê qaşo li Tirkîyeyê di warê mafên mirovan de hinek reform pêk hatine. Lê hîn jî li Tirkîyeyê mafên mirovan tînin binpêkirin. Çewsandina bawerîya mirovan ji hêla polîsan ve û zêdebûna kuştina mirovan di binçav de bi destê hêzên ewleyî. Ev rêbazên gemarî bûne xislet ji Komara Tirk re. Sîcîla Tirkîyeyê û dîroka wê ya li Rojhilat, Başûr û Kîbrîsê nîşan dide ku ew dev ji van kirînan xwe bernade.

Desthilatdariya Tirkîyeyê li dijî gelê Kurdistanê çekên giran bi kar fîne. Dixwaze bi çekên ku DYA'yê danê PKK'ê ji navê rake. Dewleta tirk Ji sedî 80'yê çekên xwe yên giran ku bi wan 3000 gundên kurdan şewitandin û valakirin ji DYA'yê distîne. Her wiha di van demên dawî de dewleta tirk rojnameger Ragîb Duran ji ber hin ramanên wî yên derbarê kurdan de avête girtîgehê.

Li hêla din Komara Tirk bi hinceta parastina tirkên Kîbrîsê 30.000 leşkerên xwe li Kîbrîsê belav kir. Wekî tê zanîn TC yekemîn car bû ku li xwe mikur hat

ku pêkan e li Kîbrîsê di navbera wê Yewnanîstanê de şerekî çekdarî derkeve. Di heman demê de DYA'ê bi lez da xwe ku balafirên xwe yên pêşkeftî F15 û F16'yan bifiroşe van her du dewletan.

Li gorî zagonên derbarê hinarde û bazirganiya çekan de peywîr didin ser komîsyoneke hevbeş da ku çekên Amerîkayê ji dewletê ne demokratîk re neyên hinartin û li dijî welatên cîran û li dijî mirovên sivil bo binpêkirina mafên mirovan neyên bikaranîn.

Deklerasyona pêşnûmaya qanûnên ku Mack Kinney/ Robrabache amade kirine, ji yên ku Nûner Sam Gejdenson (D-Com) danîne gelekî çêtir e. Ji ber ev zagon pêşin rê li ser firotina çekên giran bo welatên ne demokratîk tengtir dike û mercên firotinê diyartir in. Di van salên dawî de bi Peymana Osloyê çandîna mayînan hate qedexekirin, li ser vê yekê Konseya Senatoran a Amerîkayê biryar da ku hinardeya wê bê rawestandî.

Yekîtiya Ewrûpayê Komîteya Aştiya Nobelê di bin serokatiya serokê berê yê Kosterîkayê Oskar Ariyas damezirandibû. Serokê komîteya navborî Ariyas li danîna destûrên hinardeya çekan îsrar kiribû, ji pêşnûmaya encamê diyar bû ku Ewrûpa û DYA li cihanê %80'yê hinardeya çekan di dest xwe de digirin.

Li vir dimîne rîyeke tenê bo çareserîkirina mijarê; ew jî tevgera gelê Amerîkayê. Ev tevger dikare rê li ber hinardeya çekan teng bike, ew dê bibe gava yekemîn û bingehîn di cihanê de bo astengkirina hinartina çekan bo rejîmên diktatorî.

Niha dema derxistina zagonên û rêznameyên li ser hinardeya çekan û astengkirina şandina çekan ji rejîmên sîtemkar ên cihanê re.

Rêzimanê kurmancî

- Wane 30 -

SAMÎ BERBANG

Raweya fermanî

Ev dem bi alikariya raya (koka) dema niha ya lêkerê û qertafa raweya fermanî /bi-/ tê holê. Ji ber ku ferman li kesên duyemîn ên yekjimar û pirjimar tê kirin, cînavkên pêrebestî yên ku tên dawîya vê raweyê jî /-e/ û /-in/ in. Bo nimûne em lêkera "çûn" hildin dest. Her wekî berê jî hatibû gotin, raya dema niha ya lêkera çûn /ç/ ye. Dema em qertafa fermanî /bi-/ binin pêşiya vê rayê "biç" derdikeve holê, piştî cînavkên pêrebestî yên ku li jor çêlî wan hate kirin, bîn dawîya vê peyvê, dirûvê raweya fermanî ya lêkera çûn; "biçe/biçin" derdikeve holê.

Mînak:

Şîva êvarê bi-xw-e /bi-xw-in
Pirtûkêkê bi-d-e/ bi-d-in
Vi hevalî jî bi- b- e/ bi-b-in
Vê mehîne bi-firoş- e/ bi-firoş-in
Kêrekê bi-stîn-e /bi-stîn-in
Kavîrêkî bi-kir-e/ bi-kir-in
Xwe bi-kuj-e/ bi-kuj-in
Avê bi-rijîn-e/ bi-rijîn-in

Raweya xwestinî

Ev rawe daxwaza û niyeta ji bo pê-

kanîna karekî tîne zimên û dirûvê lêkerê li gorî demê diguhere. Ji bo diyarkirina vê raweyê mirov dikare peyva "xwezî" li peşiya hevokê deyne.

Dema niha

Di vê dema raweya xwestinî de lêker di dirûvê dema bê de ye, lê daçeka dema bê nayê bikaranîn. Her wekî li jor jî hate gotin, ji bo veqetandina vê raweyê ji raweya fermanî mirov dikare peyva "xwezî" bi kar bîne.

(Xwezî) ez biçim.

(Xwezî) tu ji min re bibêji.

(Xwezî) ew nameyekê bişîne.

(Xwezî) em şîr vexwin

(Xwezî) hûn tiştêkî ji bir nekin.

(Xwezî) ew rastî belayekê neyên.

Çirokiya raweya xwestinî

Di vê demê de dirûvê lêkerê bi temamî diguhere. Li ber lêkerê dîsa qertafa raweya fermanî heye, lê îcar raya dema borî ya lêkerê heye û li dîv wê jî qertafa /-a/ tê bikaranîn. Bo nimûne bila lêkera me "xwendin" be, raya dema borî ya lêkerê "xwend" e, dema qertafa raweya fermanî /bi-/ bê pêşiya wê dibe "bixwend" û piştî ku qertafa /-a/ hate dîv dibe "bixwenda". Di vê demê de gerguhezî û negerguheziya lê-

keran girîng e, lewre di lêkerên gerguhez de cînavkên ji koma duyemîn, di yên negerguhez de jî cînavkên ji koma yekemîn tên bikaranîn. Dîsa em dikarin peyva "xwezî, xwezilka, xweziya" bîdin ber hevokê. Ji bo mînak mirov dikare çend hevokên wiha saz bike:

Bo lêkerên gerguhez

Min pirtûk bikirîya.

Te nan bixwara.

Wî heval bidîtana.

Me tu vexwendaya.

We birayê min bianiya.

Wan kulîlk biçandana.

Bo lêkerên negerguhez

Ez biçûma mala wan.

Tu ji gund bihataya.

Ew ji erdê rabûya.

Em bi lez bibeziyana.

Hûn bireviyana.

Ew bilind bifiriyana.

Çirokiya dema boriya têdeyî

Her wekî berê jî li ser hate rawestandin, ev dem bi pevxistina raya dema borî ya lêkera bingehîn û lêkera "bûn", tê holê. Dema qertafa /-a/ bê dawîya wan, çirokiya dema boriya têdeyî ya raweya xwestinî pêk tê. Heke lêkera me "xwarin" be, dirûvê çirokiya dema bo-

riya têdeyî ya vê lêkerê "xwaribû" ye. Ger em qertefa /-a/ bi dîv wê formê bixin, ew dibe "xwaribûya". Mirov dikare çend mînakên din jî lê zêde bike. Divê dîsa mînakên ji bo lêkerên gerguhez û negerguhez ji hev cuda bin.

Bo lêkerên gerguhez

Min kevîr avêtibûya.

Te ez dîtibûma.

Wê ji min re gotibûya.

Me para xwe ji wan standibûya.

We ji me xwestibûya.

Wan em dîtibûna.

Bo lêkerên negerguhez

Ez çûbûya malê

Tu ketibûya erdê

Ew hatibûya gund

Mala zalîman şewitibûya

Çavên dijmin rijîbûna

Hûn liviyabûna

Ew westiyabûna

Raweya bilanî

Wekî tîbiniyekê em divê bidin zanîn ku raweya bilanî jî bi heman şêweyî tê pê, bes di cihê peyva "xwezî" de peyva "bila" heye. Ji bo zelalkirina mijarê mirov dikare çend mînakên li ser vê raweyê jî bide.


Bila ez bêm. (dema niha)

Bila tu bihatayî (çirokiya raweya xwestinî)

Bila hatibûya (çirokiya dema boriya têdeya ya raweya xwestinî)

Qetlîama li ser zarokên kurd

MAHMUT KILINÇ



Firat Kivanç, zarokê kurd î 12 salî bû. Hefteya borî, li Kurdistanê li Wanê, di dest Firat de paketêke biçûk hebû û ew diçû mala xwe. Êvar bû, dereng bû. Firat bilez dixwest zû bigehêje mala xwe. Riya wî, di ber lojmanên leşkerên dagirker re derbas dibû. Wexta ku, Firat hat tanga lojmanan, leşkerê tirk di dest de MG-3, bê pîrs û îqaz Firat da ber guleyan û Firat li wira jiyana xwe jî dest da. Heta îro çend kevokên wekî Firat, bi destê leşkerên dagirkeran hatine qetilkirin?! Ka digotin, "Mehmetçik" bi merhamet e? Digotin, "Mehmetçik bi quwet e?" Ew çawa merhamet û quwet e ku, zarokê 12 salî û destvala dide ber guleyan û bê pîrs û îqaz dike.

Ev ne merhamet e û ne jî quwet e. Ev hovîti ye. Ev tirs û xofa dilê leşkerên tirk e. Malbata Firat, ji ber zordestiya dewleta tirk, ji bajarê Sêrtê ji Qeza Dihê (Eruh) koçber bûye û hatiye Wanê.

Dayika Firat dibêje; "Me li ber zor û zilma dewletê bar kir, bi baweriyê ku edî zordestî li ser me rabe em hatin Wanê. Li vir jî zordest-

tiya dewletê li ser me neqediya û leşkeran di nava bajêr de û li ber çavan lawê min kuşt." Dayika Firat ne bi tenê, bi deh hezaran dayikên zarokên kurdan, li dîv meytên zarokên xwe hêstir barandine. Hinek ji wan weka Firat bi guleyên dijmin, hinek bi mayinên ku dijmin li ser axa me çandine, hinek ji wan bi lêdan û pelçiqandinan, hinek ji wan wekî bi hezaran mirovên ji Helepçeyê bi bombeyên dijmin hatine kuştin.

Şerê gemarî, li ser civaka Kurdistanê zirareke gelek mezin pêk tîne. Di nav vê zirarê de para zarokan bêhtir e. Mayinên ku li der dora gundan arteşa tirk çandine, dibin sebebe kuştina zarokan. Li çolê, an li ser tingên leşkerî bombeyên wan neteqiyana, zarok bi wan dilîzin û bi teqîna wan an dimirin an jî seqet dimînin.

Ev hemû dibin sebeba kuştina zarokên me. Dîsa jî xetera herî mezin, xirabûna tenduristiya zarokên Kurdistanê ye. Ji ber şerê gemarî, malbat li gorî dilê xwe nikarin zarokên xwe di warê xwarin û vexwarinê de xwedî bikin. Parastina wan, ji serma û nexweşiyê bes nake. Di çadîrên naylonî de, qey mirov çiqas dikane zarokên xwe biparêze? Ji nexweşiyê jî, li gorî pêwîstiyê tedawîkirin tune ye. Her wiha îro li Tirkiyeyê, ji hezar zarokên ku ji dayika xwe dibin, 25 dimirin. Ew hejmar li Kurdistanê 90 e. Yanê, li Kurdistanê zarok, ji Tirkiye çar caran bêhtir dimirin. Zarok û xort, hêvî û pêşeroja neteweyan in. Eger ew her du nişên civakê, bi her awayî baş negihêjin, diwaroja neteweyan tarî ye. Di warê perwerdeyî de, ew xetera ji bo

gelê Kurdistanê bi giranî îro heye. Her wiha, kesên ku di vî warî de gihîştine jî, ji ber zor û zilma dewletê Kurdistanê terk dikin. Eger mirov, bi çavêkî bêlayan li van babetan binêre, ferqeke mezin di nav gelê Kurdistanê û Tirkiyeyê de derketiye holê. Ew ferq her ku diçe, kêma nabe hê jî kûr dibe. Îro li rojavayê Tirkiyeyê, zarokên tirkan bi kompetûran dilîzin, mixabin li Kurdistanê zarokên kurdan makîneyên ku hesabkirinê hê nas nakin. Ew ferq, yê çawa were dagirtin? Dewletên dagirker, bi hezaran zarokên wekî Firat Kivanç bi guleyan dikujin. Bi milyonan jî, bo politîkayên xwe yên kolonyalist li paş dihêlin. Îro dinê bi gavên mezin bi pêş de diçe û di vî warî de pêşveçûna dinê, qonaxeke gelek mezin jî standiye. Eger gelê Kurdistanê, di vî halî di bimîne, hemû gelên dinê dê bi pêş de herin, lê gelê Kurdistanê dê li şûna xwe bimîne. Ew jî, ji bo xerabûna civakê dewsek xeter e. Em çawa jiyana zarokên xwe biparêzin, wan çawa stare bikin? Ji bo ku gavên pêwîst bîn avêtin, divê şerê gemarî biçede. Binêrin, agirbesta ku PKK'ê diyar kiriye, dewleta tirk naxwaze lê guhdarî bike. PKK, agirbestê diyar dike, lê dewleta tirk, ji berê bêhtir operasyonên xwe dimeşîne. Divê ew şer bisekine. Ew operasyon bisekinin.

Eşkere bû ku; heta ku dewleta tirk mecbûr nebe, naxwaze dest ji şerê gemarî bikişîne. Ji bo vê yekê, divê hemû gelê Kurdistanê li dijî şerê dewleta tirk dengê xwe bilind bike. Ji bo ku, tu Firat Kivançê din neyêne kuştin. Ji bo ku, diwaroja gelê kurd ji tariye derkeve û ronahî bibe.

Şowalyayekî bi pênuş: Musa Anter

Her çiqas wî, hez ji çekê nedikir jî, ferzbûna şerê çekdarî dianî ser zimên. Ji ber vê çendê wî, Süleyman Demirel li ser Çiyayê Cûdiyê dawewî duelloyê kir. Dîsa li ser şhadeta Vedat Aydın û Hüseyin Deniz wiha gotibû: "Ger ez xort bûma, min dê berê xwe bida ser çiyê!"

ŞÊXOYÊ ZIVINGÊYÎ

Ez bawer im dê ev sernav gelek kesian şaş û metel bihêle. Lewre gelek kes bi navê Musa Anter yê Şêxmus Elmas nizane. Çiroka vî navî jî heye. Ji ber ku jî dê û bavê Musa Anter re lawik çênebûne, wan berê xwe dane Ziyaretgeha Siltan Şêxmus. Li pey çûna vî ziyaretê, Musa Anter jî dayik bûye. Lewma dê û bavê wî, navê Şêxmus li wî dikin. Ji ber vê yekê navê yekem ê Musa Anter Şêxmus Elmas e. Lê ew nav piştre hate guhartin

Musa Anter gelekî zû pê hesiyabû, ku Komara Tirkiyeyê li ser bingehê şaş hatiye danîn. Her wiha wî, ev şaşî, bi çavê serê xwe dît. Ji ber ku gundiyan wî lédan xwarin (bes ji ber ku bi tirkî nedizanin), wî dest bi dibistanê kiriye. Di dema zanîngê de ketiye refên tekoşîna neteweyî ya kurdan û heya ku şehîd bûye bi awayekî çalak li ber xwe daye. Wî, li dijî çewsandin û tadeyên xedar jî dev ji doza xwe bernedaye. Jixwe ew bi pênuşê xwe yî mîlîtan nemir bûye.

Mirov dikare jiyana Musa Anter di sê beşan de bîne ser zimên: 1940-1976, 1976-1984, 1984-1992. Beşa yekem, dema zevî çandinê, ya duyem dema bejîtiyê, ya sêyem jî dema dirûtinê ye. Wî wisa baweriyaya xwe pê anîbû ku, dema bejîtiyê qediyaye. Her çiqas wî, hez ji çekê nedikir jî, ferzbûna şerê çekdarî dianî ser zimên. Ji ber vê çendê wî, Süleyman Demirel li ser Çiyayê Cûdiyê dawewî duelloyê kir. Dîsa li ser şhadeta Vedat Aydın û Hüseyin Deniz wiha gotibû: "Ger ez xort bûma, min dê berê xwe bida ser çiyê!" Ez ne bavîtiya Musa Anter, ez bêhtir ji bo ku yek ji wan bi hezaran zarokên Musa Anter im, ez serbilind im. Wî, bi çavê li zarokên xwe û ciwanên kurdan nihêrt. A rastir, zêdetir berê xwe dida ciwanên kurd. Bi baweriyaya Musa Anter, tiştê herî girîng xwenasîn û xwedî şexsiyêtbûna mirov bû. Ji ber ku wî, siyaseta Tirkiyeyê ji roja roj de fêr kiribû, me dil heye vî rewşê û wî bi pêkenokeke Musa Anter bi bîr binin.

Jinîkek lawê xwe yê nexweş dibe doktor. Doktor lê dînihere û dibêje jinîkê: "Derbasî odeyê be û kincên xwe ji xwe bike!" Jinîk diheyire û dibêje: "Lê yê nexweş ne ez im!" Doktor lê vedigerîne: "Ez pê zanîm. Lewma em ê zarokê nû çêkin."

DICLE ANTER

APÊ.....

ew mijarên ku te şirove kirin
bi xewer
bi derzî
heta bi bijûn
bin jî
neviyên te
Yanê em zarokên Hetawê
ruwên me mîna bafonê
li gopûkên çiyayan diçirsin.

Ma qey nizanim
tu ji me baştir mi dinasî?

tu çuyî
em hinek bêhtir ewk bûn
yanê hinek bêhtir Netewe
hinek bêhtir destbikarên Yezdanê
Bestê

em neviyên te
ên 'di mekteban de rîti'
bûn Helbestvan û tehlîlvan

ew mijarên ku te şirove kirin
dîsa jî kêma in bawer bike
dîpirsim ji te ey Apê:
Mirin dikeve kîjan babetê?

KAWA NEMIR



Ev Çinara mezin û spehî roja 20'ê rezbera 1992'yan li Amedê hate xistin. Lê ew her geş dibe û şaxên xwe vedide.

"Lo birakno!
Bila pirs di
nav me de
be û neyar
nebihîsin,
heftê salî jî
ne hindike
ha..! Keç û
Xortên
Kurdan, ma
ez ji we re
çi dirêj bikim.
Hûn dîzanin,
dayika birastî
Welat e"
(Welat, 15
gelawêj
1992)

KURDÊ ŞKEFTÊ Û REWŞENBÎRÊ DEWLETÊ

Wekî tê zanîn berê cara yekem kurd, di dema leşkeriya bo artêşa tirk de li tirkan rast dihatin. Jixwe li welatê xwe jî dema pirs dewletê dibû, tenê artêş dihat bira wan. Mirovê kurd heta dawiya jiyana xwe behsa serpêhatiyên xwe yê leşkeriyê dikir. Ji van serpêhatiyên tesîra îdeolojiya dewletê gelekî zelal xuya dibû. Dembûhêrkên wan li ser leşkeriyê germ dibû û bêyî ku di ser re qewaz bidin, digotin: "Dema ez nû gihîştim birlîxa (yekîne) xwe, qumandarê min gotê min: 'Tu li kîjan şkeftê çêbûye? Tu li kîjan şkeftê dimînî?' " Bi van gotinan dixwestin, bidin xuyakirin, ka kurd çiqas nezan, hov û paşverû ne. Belê Apê Musa jî li şkeftê jî dayik bûbû û zarokatiya xwe li şkeftê derbas kiribû. Êdî jî xwe re lê temaşe bikin, ka kurdê şkeftê çi kir li serê rewşenbîrê dewletê.

Zivistana 1893'an bû. Li dibistana gund (Stîlîlê bi ser Nîsêbinê ve ye) civîna malbatên xwendekaran hebû. Wê demê dîsa mala Apê Musa wekî weqfekê bû, 5-6 xwendekarên ku gundê wan dîr bû, li cem xwe dihawandin. Ew jî wekî berpirsiyarên wan 5-6 xwendekaran hatibû civîna malbatan.

Wê demê mamosteyekî nû hatibû gund. Hîna hay ji şertên jiyana welatê me nebû. Dema civînê rabû ser xwe, sînga xwe bel kir û got: "Rewşa zarokên we gelekî xirab e. Em ji bo ku tiştêkî hînî zarokên we bikin, xwe dihetikînin lê hûn li malê radizên. Bi vî awayî naçe serî! Gerek e hûn bi kêmanî her roj du seatan alikariya zarokên xwe bikin. Nexwe hûn hemû sûcdar in." Piştî vî Apê Mûsa rabû ser xwe û li mamoste vegerand: "Kurê min! Ma qey tu pê nizanî, ku dê û bavê wan zarokan bi tirkî nizanin? Ev li aliyekî ev kes bi xwendin û nivîsînê jî nizanin. Wê çawa alikariya zarokên xwe bikin? Rast e. Rewşa zarokan ne baş e. Lê ku jî dêvla zarokên me, zarokên we bûna, wê rewşa wan xerabtir bûya. Dema yê we dest bi dibistanê dikin, bi zimanê dayika xwe dixwînin û dinivîsîn. Lê yê me li aliyekî hînî zimanê we dibin, li aliyekî jî hînî xwendin û nivîsînê dibin." Mamosta di cih de sar bû û matmayî ma. Bîstekê sekîni û behsa mijareke din kir: "Mîna li arşiv û dosyayan nihêrî. Ev sê sal in ku Xebatên Komên Perwerdehiyê (Eğitsel Kol Çalışması) li dar nakevin. Nebûna vî yekê jî bo dibistana me felaketeke gelekî mezin e!" Apê Mûsa carekê din rabû ser xwe û bêyî destûra mamoste wiha got: "Mamos-tayê delal! Bala min li ser te ye. Te hay ji rewşa vî deverê nîn e! Tu li devereke din dijî. Ev sê sal in ku meclîsa dewletê betal e. Tu vî yekê felaket nahesibîni. Lê li dibistanê hin xebat nayên kirin, tu dibêjî ev felaket e!"

Dawiyê zimanê mamostê şkest û nema axivî, ta ku şênî belav bû.

FAİK YAĞIZAY

□ 24.09.1996

Li Zindana Amedê Deh girtî hatin kuştin

Li Zindana Amedê polis û leşkerên dewleta tirk, êrişek hovane bir ser 34 girtiyên. Berî êrişê her çiqas girtiyên xwestibe pirsgerêkê bi hevditinan çareser bikin jî, îdareya zindanê xwe neda ber çareserkirina pirsgerêkan û bi fermana ku ji jor standibûn, wan êriş bir ser girtiyên. Di vê êrişê hovane de bi navê: Mehmet Aslan, M.Sabri Gümüş, Cemal Çam, Rıdvan Bulut, Nimet Çakmak, Kadri Demir, Hakkı Tekin, Erkan Perişan, Ahmet Çelik, Edip Direkçi jiyana xwe ji dest dan.

BÛYERINE JI DÎROKÊ

□ 24.09.1990

Zeynal Akyar (Firat) şehîd ket

Firat di sala 1970'an de li Xolikê ku girêdayî Navçeya Nazîmîyeya Dêrsimê ye tê dinê. Ew diçe Hollandayê cem malbata xwe ku li wir dijî. Piştî ku li wir dibistana teknîkî kuta dike, demekê li Almanyayê di nav partiyê de xebatê dike. Di 1988'an de diçe Akademiya Mahsun Korkmaz û piştî perwerdehiyê diçe Botanê. Di 24'ê rezbera 1990'î de li nêzî Xana Hewel, di şerekî de dema dixwaze çeka leşkerêkî hilde, bi guleyekî xavîn şehîd dikeve.

Ji NÇM'ya Edeneyê Koma Medya Emê ji rastiya xwe venegerin



Koma Medya giş ji xwendekaran pêk tê. Danekî li NÇM'ê, danekî li zanêngehê xebatên xwe dike.

Çawa ku bayê azadiyê û rizgariyê geş û fireh dibe, bi firehbûn û geşbûnê NÇM'ya Edeneyê jî xwe ji aliyê hunerî û çandî ve geş û fireh dike.

Li NÇM'ya Edeneyê piştî Koma Rewşen û Koma Sarya ya muzîkê niha jî di bin banê NÇM'ya Edeneyê de komeke nû bi navê Koma Medya hate damezirandin. Endamên Koma Medya tevahî ji xwendekaran hatiye amadekirin ji ber vê yekê jî endamên komê karên xwe yê muzîkê danekî li NÇM, danekî jî li Zanîngeha Çukurovayê berdewam dikin. Koma Medya di warê muzîkê de komeke nûjen e, ji ber vê yekê jî dixwaze muzîka kurdî bi tarzeke nûjen pêşkêşî gel bike. Koma Medya xebatên xwe bi hêzeke neteweyî û şoreşger di bin şertên dijwar de berdewam dike. Endamê Komê Abdurrahîm li ser muzîka ku ew dixwazin pêk bînin, dîtînen xwe wiha anîn zimên:

"Em dixwazin muzîka kurdî bi rengêkî nûjen bi hêzeke akademîkî pêk bînin.

Ji aliyekî din ve jî em dixwazin muzîka kurdî bi tarzeke otantik bi rengêkî modern çêbikin. Me di nava şoreşê de cihê xwe di bin banê çandî û hunerî de girtiye û em dixwazin ne tenê bi zimanê herêmkî an zaravayekî, bi hemû zaravayên kurdî an bi zimanê neteweyî stran û helbestên xwe bibêjin. Di huner û çandê de em dixwazin bi enternasyonalîzmê re bimeşin û em naxwazin ji rastiya xwe vegerin".

Her wiha komê ji bo xwendekaran û ji bo kesên ku bi vî rengî dixwazin di koman de cih bigirin ev gotin: "Em li dibistanê wextê xwe pir vala derbas dikin. Ev jî taybetiyeke birjuwaziya biçûk e. Xebata li saziyê çêşeke cuda dide mirov. Em van wan kesan dawefî van qadan dikin." Komê di vê mijarê de dîtînen xwe wiha diyar kirin: "Xwendekar divê hîn bêhtir têkeve nava gel. Nirxên gel bi awayekî zanayî divê bi kar bîne û bixebitîne."

Koma Medya di warê çand û huner de gelek berhemên heja derxistine. Wekî: Strana bi dimilkî bi navê "Usarawa", merşa bi navê "Enî û Artêş" û yê gelêrî ku li ser muzîka wan xebat kirine: "Hat Karwano", "Ha Desto", "Çillê" û hwd. Helbest û stranên komê bi tevahî li ser şer, şoreş û evînê ye, helbestên xwe yê gelêrî bi tarzeke nû di bernameyên xwe de pêşkêşî dikin.

Di repertûara Komê de helbest û stranên kurdî (kurmançî û kirdkî), tirkî, û erebî hene. Koma Medya dixwaze di warê çandî hunerî û şoreşgerî de bigihîje asteke bilind.

Kom ji 6 kesan pêk tê û ev endamên komê dixwazin amûrên mûzîkê bi hêzeke têkoşer bi kar bînin.

Kom, bernameyên xwe ne tenê li NÇM'ê, li hemû deran pêşkêşî gel dike.

FEYZÛLLAH YILDIRIM/ EDENE

ÇAVDÊRÎ**Agirbest**

SERKAN BRÛSK

"Şer dikim, şer naxwazim. Ez welatê xwe dixwazim". Dilovan...

"Biçûkê çanê hatiye cihanê, ne ji bo kuştinê, ji bo jiyane". Dilgeş.

Şerokê PKK'ê Birêz Abdullah Öcalan 28'ê gelawêjê di tele-konferansa ku zindî di MED-TV de hate weşandin de, ku gelek rojnamevan, ajans, endamên saziyên sivil û parlamenterên kurd û biyanî rûniştibûn, sêyemîn agirbest beyan kir.

Heta niha rayedarên tirk xwe ker dikin.. Rayedarên ku ev mesele ji wan jî tê pirsîn, serfermandarê nû yê tirk li singa xwe dide û dibêje: "Kî dibêje ku ez nerm im. Kî van gotinan dibêje ew li min heqaretan dikin. Yanî dibêje ew jî, xwînrij e."

Jixwe em dibînin ku bi hatina wî re operasyonên leşkerî li herêma Botanê jî nû ve dest pê kir. Li gorî çavkaniyên gerîla leşker hewl didin ku têkevin herêmên ku heta niha ew neketinê. Jixwe cih cih di navbera hêzên tevgera rizgarîxwaz û wan de şer çêdibe û amadekariyên pozberiyên berfireh jî tê kirin. Wekî din jî şewitandina daristanan, dorgirtina gundan didomin û vê dawiyê jî panzerek leşkerî li xwazginiyên ku ji xwestinê tèn direşîne, kesek tê kuştin û hinek jî birîndar dibin. Û gelek bûyerên din ên ku beramberî sivilan bi berdewamî tene kirin. Ev helwesta leşkeran beramberî agirbestê dide nîşan. Ka em li helwesta polîsan binêrin. Dayikên Şemiyê tevî rêveberên Komeleya Mafên Mirovan bi awayekî hovane hatin girtin. Dîsa otobûsên ku qerar bû, ji bo Roja Aştiyê herin Amedê, li benda wan rast hat.

Çapemeniya wan xwe nebihîstî dike. Geragop dilîze. Ew jî wekî leşker û polîsan tev digerin. Ji bo aktûelkirina agirbestê çapemeniyê heta niha tiştêk berbiçav nekiriye. Dema helwesta organên dewletê yê serekî ev be, diyar e ku ev agirbest dê zêde neajo. Ha dewlet çima xwe wisa nebihîstî dike. Bersiva ku ez bidim vê pirsê, ev e: Amerîka niha cidî li ser plana xwe ya Rojhilata Navîn difikire. Dixwaze rojekê berî rojê vê planê tixe jiyane. Plana desthilatkirina tirk û Israîl li Rojhilata Navîn. Ev plan bi dilê tirk e û wan heta niha ji bo pêkanîna vê planê gelek xebat kirine. Mesut Yılmaz, ji bo pêkanîna vê planê çû Urdir û Israîlê. Her çiqas ew di daxuyaniyên xwe de dibêje ku ev plan ne li dijî kesî ye jî, lê avakirina bendekê ku dora welatên Rojhilata Navîn digire bi daxuyaniyê devkî hilnawese. Ger ev bend jî aliye leşkeran ve were lêkirin, ma îmkân hene ku ji gelan re nebe dîwarê girtîxaneyê?

Mesudê PDK'ê wek kundekî ji niha ve dixwaze derkeve serê vê benê û bixwîne. Dema mirov ji vê pencereyê ve li agirbestê dinêre, mirov agirbesê dibîne. Me behsa bendekê ku bi hemû hêza xwe li dijî gelan e kir. Gelo ev bend bê dijber e? Na bendek din jî di van rojan de tê lêkirin. Her çiqas ev bend ne wek a van bi îstikrar û pêşerojî jî bixuye, lê tevgerêk heye. Yewnan, ecem, ereb û ermenî jî cihên xwe li wî aliye satrancê xweş kirine. Ew jî dixwazin ekîbeke yekgirtî derînin pêşberî vî taqimî. Lê sist û pîrnîsî xuya dikin. Rewşa rûsan vî taximî qelstir dike. Xeyo (ereb) di bin bawera operasyona firtina çolê de mane. Dikin nakin nikarin wê xweliyê ji ser xwe biavêjin. Çavên wan ji pêşeroj, paşeroj û îro re jî girtî ye. Wan bi xwe de anîne. Belê dema mirov wan her du kendalan dide ber hevdu, kendala hêzên ewil bilintir û saxlemtir dixuye. Ev jî şer û çeng e.

Dengê ketî yê Ewropa jî vê dide nîşandan. Wisa xuyaye ku Amerîka xwe wekî hirçê, berdaye ser wan û dengê wan biriyê. Ew dengên ku derdikevin jî dengên sivilan û hogirên gelên me ne.

Lê em kurd bi rastî naxwazin bikujin û bimirin. Em dixwazin serbest û azad li ser xaka xwe bijîn. Van herdu hunermendan çiqas xweş gotine. Kurd û kurmançî wisa diyar e ku dê di demeke kin de kilama "Şer dikim, şer naxwazim" were gotin.


Şewitandina gundên kurdan, ne tenê ji layê hiqûqî ve ji layê exlaqî ve jî bînpêkirina rûmet û şerefa mirovan e. Vê gavê agirbesteke yekalî hatiye ragihandin. Divê ev agirbest bê bersivandin. Piştî vê yekê mirov dikare behsa çareseriyê problemên koçberan bike. Ev agirbest bo me hêviyek e.

■ **Bi giştî li Tirkîye û Kurdistanê bi taybetî jî li Stenbolê rewşa koçberiyê ya dawîn çawa ye? Pirsgirêkên koçberan ên bîngêhîn çi ne?**

Li Tirkîyeyê destpêka koçberiyê gelekî kevn e. Li dora sed salî ye, bi darê zorê koçberkirin pêk hatiye. Di salên 1920-30'î de têkoşîna kurdan a neteweyî, bi çewsandin û koçberkirinê re rû bi rû maye. Di wê serdemê de jî gund hatine şewitandin û valakirin. Li herêma Anatoliya Navîn, Deryaya Reş û Egeyê kurdên ku di wê demê de koçber bûne, hene. Her çiqas hinek ji wan vejeriyabin ser axa bav û kalan jî, hinek jî wan asîmîle bûne. Di van demên dawî de koçberiyê mezin û erjeng pêk hatiye. Mirovên ku hatine koçberkirin li rojavayê Tirkîyeyê bi çewisandinên xedartir re rû bi rû man. Ji ber pirsgirêkên zimên, çand û aboriyê nexweşînên tenduristiyê û psikolojîkî rû dane. Bi sala 1998' an re bi taybetî li Stenbol, İzmir û Bursayê koçberên kurd beramberî gelşa vîzeyê man. Nîqaşa ku li ser vîzeyê tê kirin hîn jî didome. Her wiha bi vê re, dixwazin ev kesên bêkar û bêxanî ji van bajarên navborî bîne dîrxistin.


Wekî we jî got, vîzeyê mijara vîzeyê dîsa di rojevê de ye. Her wiha koçberên kurd ên ku diçin bajarên Deryaya Reş nayên hewandin. Hûn vî yekê çawa dinirxînin?

■ Vê dawiyê waliyên Ordu û Giresunê



Mahmut Özalp

Zarok hîn jî di dema şewitandina gundên xwe û dimenên kutanxwarina dê û bavên xwe de dijîn û di şokê de ne. Dema ku em diçin serdana wan zarokan, xwe diavêjin paşila dayikên xwe.



li ber karkerên kurd ên demsalî bûne asteng. Bi derxistina giştînameyekê hemû karkerên kurd serdanpê wekî sûcdar tîne hesibandin. Her wiha vî rewşê li Adapazarîyê jî rû da. Tenê bûyerên li Deryaya Reş di çapemeniyê de cih girt. Lê me li Balıkesir û Bursayê lêgerîneke berfireh kir. Li gorî encama vî lêkolînê li wan deran jî karkerên kurd wekî tawanbar tîne dîtîn. Hêzên dewletê nasnameyên wan desteser dikin û wan wekî koleyan didin xebitandin. Ji bo ku herin herêmeke din, divê hûn biçin li qereqolê û agahiyên di nasnameyên xwe de diyar bikin.

Ev herêma koçberên kurd wekî girtîgehê ne. Raya giştî hay ji van rûdanên hovane û nemirovane nîn e. Tetbîqkirina vîzeyê jî ne bi awayekî fermî lê bi awayekî fiilî pêk tê. Ev ne li gorî rêz û rêçikên dewletê ye jî. Di heman demê de ev cudaxwazî ye jî. Di navbera gelek welatan de bikaranîna vîzeyê tune ye. Lê wekî ku Stenbolê welatekî cuda be, bi rêzikên tund dixwazin ketin û derketinê kontrol bikin.

Ger me pêşniyareke bi vî rengî araste bikira, em dê ji ber cudaxwaziyê bihatana darizandin. Ez ne bawer im, ku daxwaza vîzeyê pêşniyara R. Tayyip Erdoğan be. Di 1934' an de zagona koçberkirina mecbûrî jî hêla meclîsê ve tê derxistin. Rûdanên îro jî berde wama vî siyasatê ne. Ev mînakên berbiçav rewşeke fiilî didin der. Îro li Ege û Marmarayê desteserkirina nasnameyan nîşaneya vî yekê ye; "hûn li vir bi tenê wekî koleyan, barkêşan dikarin bixebitin, hetanî ku hûn ji vir neçin hûn nikarin van nasnameyan ji me bistînin" tê gotin. Mirovên ku nasnameyên wan ji destê wan hatine girtin kole ne. Lewre nikarin tu tiştî bikin. Tetbîqkirina vîzeyê, ji bilî Stenbol, İzmir û Bursayê li deverên din bi rengê fiilî didome.

Bi dîtina we di navbera koçberiya ku ji ber egera aborî pêk hatiye û ya ji ber şer pêk hatiye de çi cudahî heye?

■ Mirovên ku ji ber sedemên aborî koç dikin ji hêla aborî, civakî û psikolojîk

ve xwe amade dikin û bi vî awayî bi cih û war dibin. Her çiqas bédil bin jî bi vîna xwe koç dikin. Lê di koçberkirina mecbûrî de mirov bêyî dilê xwe tîne koçberkirin, piraniya wan li ber xwe didin û beramberî zîlm û zordariyê dimînin. Her wiha hemû derfetên wan ên aborî ji destên wan tîne standin.

GÖÇ - DER'ê di warê navxweyî û navneteweyî de bo çareserkirina gelşa koçberan çi gav avêtine?

■ Bi Ewropê re hîn tîkiliyên me hene. Lê tîkiliyên me ne fermî ne, bêhtir bi serdanan tîne meşandin. Li Tirkîyeyê jî bi hin sazîyên demokratîk re tîkiliyên me hene. Di nav van de İHD û Mazlum-Der ên sereke ne. Koçberkirina mecbûrî li gorî hiqûqa hundirîn û navneteweyî jî neqanûnî ye. Di raporên Komîsyona Lêkolînê ya Meclîsê (TBMM) de jî valakirina gundan û koçberkirina mecbûrî bi awayekî zelal cih digire. Jixwe waliyên herêmî jî diyar dikin ku, ji bo valakirina gundan û koçberkirinê tu fermaneke wan tune ye. Valakirina gundan bi tevayî li gorî kêfa artêşê pêk tê. Her gund bi rêbazeke cihê û bi hincetêkê tê valakirin û şewitandin. Ji hêla hiqûqî ve tu fonksiyoneke wê tune ye.

Em wekî Göç-Derê heta ji me tê, zorê didin hiqûqa hundirîn, da ku bi erka xwe rabe. Bi vî mebestê gelek kes serî li me didin. Di vî warê de hiqûqa hundirîn bi erka xwe ranabe û gel jî pê ne bawer e. Di gel vî jî divê em tî bikoşin. Bi hezaran kes serî li me didin. Em jî van serdanan radigihînin Wezaretê Karê Hundirîn. Ji bo ku em tazmînata mafên ku hatin bînpêkirin bistînin û bîngêha vegera bo gundan deynîn, xebatên bi vî rengî girîng dibînin.

Hetanî ku pêşeskirinên mafên mirovan ji navê ranabin, perqaleke demokratîk pêk naye. Şewitandina gundên kurdan, ne tenê ji layê hiqûqî ve ji layê exlaqî ve jî bînpêkirina rûmet û şerefa mirovan e. Vê gavê agirbesteke yekalî hatiye ragihandin. Divê ev agirbest bê bersivandin. Piştî vî yekê mirov dikare behsa çareseriyê gelşên koçberan bike. Ev bo me hêviyek e.

Rayedarên Tirkîyeyê di qada navneteweyî de doza mafên mirovan dikin lê li Kurdistanê jî komkujiyan li dar dixin...

Daxuyaniyên berpirsên dewletê yê bi vî rengî îro li herêma kurdan derbas nabin. Her wiha dewlet dixwaze li derveyî axa kurdan jî tesîrê li wan bike.

Wekî li Amedê jî hate dîtîn, mirov ji bo kirtûlek nan li navguhên hev dikevin û pev diçin. Ev yek tesîreke çawa li koçberan dike?

■ Di van heft salên dawîn de li dora 3-5 milyon kes hate koçberkirin. Koçber tevî pirsgirêkên tenduristî û birçîbûnê beramberî pirsgirêka bi cih bûnê jî dimînin û bi awayekî bi rûmeta wan tê listin. Mirovên ku divê bi her awayî doza mafên xwe bikin, ji ber kirinên dewletê ji nasnameyê xwe şerm dikin û gelş û daxwazên xwe nadin der, di hundire xwe de vedîşêrin. Ji ber biçûkdîtî û çewisandinên bi salan, mirov îro ketine tengasiyêke psikolojîk.

Hûn li ser gelşên psikolojîk ên koçberan rawestîyan. Nîşaneyên berbiçav ên van gelşan çi ne?

Zarok hîn jî di dema şewitandina gundên xwe û dimenên kutanxwarina dê û bavên xwe de dijîn û di şokê de ne. Dema ku em diçin serdana wan zarokan, xwe diavêjin paşila dayikên xwe. Ji sedî nodê zarokên ku ji aliyê derûnî ve nexweş in, ji derfetên tedawiye jî bêpar in.

Li ser jinan jî bandoreke pir neyînî heye. Jinên ku di mala de asê dimînin, beramberî gelşa zimên dimînin û bi cîranên xwe re nikarin tîkiliyê deynin. Piraniya mirovên navsere nikarin bi tu karî re mijûl bibin, ji ber ku bêpîşe ne. Lewre jî ji bêgavîyê zarok kar dikin. Zarok jî li kuçeyan karên barkêşiyê dikin. Beşeke mezin ji zarokan ji derfetên perwerdehiyê bêpar in.

Li aliyê din dewletê bi awayekî din berê xwe da kurdan û projeyên wekî ÇATOM'ê dane avakirin. Bi baweriyê we armanca vî projeyê çi ye?

Tenê bûyerên li Deryaya Reş di çapemeniyê de cih girt. Lê li Balikesir û Bursayê jî karkerên kurd wekî tawanbar têne dîtin. Ji bo ku hûn herin cihekî din, divê hûn biçin li qereqolê û agahiyên di nasnameyên xwe de diyar bikin. Xwestina wîzeyê jî ne bi awayekî fermî lê bi awayekî fîlî pêk tê.

Serokê GÖÇ-DERÊ Mahmut Özgür:

pratîkê de vîze bi kar tê

Di van heft salên dawîn de li dora 3-5 mîlyon kes hate koçberkirin. Koçber tevî pirsgirêkên tenduristî û birçîbûnê beramberî pirsgirêka bi cih bûnê jî dimînin û bi awayekî bi rûmeta wan tê lîstin. Mirovên ku divê bi her awayî doza mafên xwe bikin, ji ber kirinên dewletê ji nasnava xwe şerm dikin û gelş û daxwazên xwe nadin der.

■ Ev proje, bi giranî li Mêrsînê her wiha li Amed, Mêrdîn û Batmanê tê pêkanîn. Armanca wê, pişaftina koçberên ku hatina van bajarên e. Xwedêgiravî bi mebesta fêrkirina xwendin, nivîsandin û çêkirina xalîçeyan hatiye saz kirin. Lê bi awayekî sergirtî dixwazin jinên kurd asîmîle bikin. Lewre jinên kurd kana çand û zimanê kurdî ne û nîrxên kurdan bi awayekî herî baş diparêzin. Ev proje ne gelşa koçberiyê, ne jî gelşa kurd çareser dike. Em bawer nakin ku pişaftina kurdan bi kêrî çanda tirkên bê. Li gorî me, divê her gel li gorî çand û zimanên xwe bijî û derfetên vî yekê bêne amadekirin. ÇATOM rûreşiya dewletê ye.


Li Kurdistanê piştî ku mercên jîyanê dakevin asteke asayî, dê vegera welêt bê rojevê. Di vî warê de helwesta gel çi ye?

■ Wekî me da xuyakirin koçberiya kurdan ev 100-150 sal in bi domdarî didome. Carina ji ber pest û pêkutiyên gur bûye. Di heyamên berê de mirovên ku hatine koçberkirin, carekêdî vegeriyanê welatê xwe an jî ji bo ku vegerin hewl dane xwe. Îro jî ger derfetên demokratîk û aştiyane pêk bên, wê gelê kurd vegere ser axa bav û kalê xwe.

Li herême tu car rewşeke asayî ya demokratîk derneketiye holê. Ger mercên asayî û aştiyane bêne saz kirin, gelê ku piştî şerê kirêt koç kiriye dê bi awayekî girseyî vegere ser axa xwe. Ên ku ji ber sedemên aborî hwd koçber bûne jî, dê bi dirêjiya demê re vegerin.

Der barê koçberiyê de li ber destên we çi îstatîstîk hene?

■ Vê gavê li ber destê me tu îstatîstîkên berbiçav tunene. Ji bo xebateke wisa demeke dirêj divê. Di vî warê de raporên Komîsyona Koçberiyê ya Meclîsê (TBMM) hene. Lê ev rapor bi awayekî rasteqînî nayê amadekirin. Li gorî rapora wan 34-28 gund hatine şewitandin û valakirin. Lê bi baweriya me li dora 4000 hezarî ye. Her wiha 3.5 mîlyon kes koçber



bûne.

Komîsyona Lêgerînê ya Meclîsê di dema lêgerînê xwe de bi Göç-Der'ê re pêwendî danin. Dema ku ev komîsyon hate saz kirin Göç-Der hîna nehatibû avakirin. Lê li Mêrsînê komeleyeke koçberan hebû. Têkiliya vî komeleyê bi vî komîsyonê re hebû. Dîtinê vî komeleyê bi rengekî sergirtî di raporên komîsyonê de cih girtin.

Ji bo pêşerojê çi projeyên we hene?

■ Vê gavê komîsyona me ya alîkariyê û tendurustiyê heye. Ligel van bi hiqûqnasan re pêwendiyên me hene. Her wiha ji bo peydakirina kar û xaniyan jî xebatên me hene.

Dewlet bi riya koçberkirinê dixwaze gel ji çand û zimanê wî dûr bixe, li hemberê vî yekê çi xebatên we hene?

■ Ji ber ku em saziyê nû ne, em niha nikarin di warê çand û zimên da tiştên bîngêhî bikin. Me gaveke girîng neavêt. Bi piranî me ji hêla lêkolînî ve hin xebat kirin. Lê li dijî vî polîtîkayê helwesta herî bi kêr birêxistinbûn e. Ji bo ku koçber sosyalize bibin, em wan tinin cem hev. Ji bo parastina ziman û çandê jî divê ev mînak li ber çavan bê girtin. Di encama xebatên xwe yê ku me di vî sala dawî di kiriyê de, em têgihîştin ku ligel xebatên hi-

qûqî û demokratîk, xebatên bo birêxistin- kirinê jî pir girîng in.

Bi Projeya Gundebajaran (Köy Kent Projesi) dewlet dixwaze çi bike û bi vî projeyê kesên ku vegeriyanê gundên xwe hene?

■ Projeyek bi vî rengî hetanî îro li dar neketiye. Her çiqas hîn rayedarên dewletê û siyasetmedar jî bo vî projeyê tiştinan bilêv bikin jî, ji meclîsê biryareke fermî derneketiye. Ev propaganda ne. Ger ev pêk were jî di hundirê xwe de koçberiyê mecbûrî dihevine.

Lêqewmîyên koçberiyê jî dixwazin vegerin gundên xwe lê naxwazin vegerin gundebajaran ku dewletê di mercên şer de ava kirine. Ev projê berê li Vietnam û Îraqê hatiye lidarxistin. Dema ku ev proje bê pêkanîn, dê di mercên şer de mirovan bike bin kontrolê. Dema ku mirovan dike bin kontrola xwe, di heman katê de wekî amûreke şer bi kar tîne. Bi vî projeyê dê dora gundan bi tîlan bipêçin, mirovan bikin cerdevan û bi mirovên din re tîkiliya wan qut bikin. Pêkanîna projeyên bi vî rengî ne gengaz e. Armanca van projeyan bo şerê qirêj afirandina çavkaniyan e. Her wiha ji welatên rojava standina finansmana şer e.

Wekî diyar e li Kampa Etrûşê kurdan

bi awayekî rêxistinî helwest girt. Gelo he- man tişt ji bo gundebajaran jî ne mimkûn e? Alternatîfa herî baş çi ye?

■ Em dikarin bibêjin yekane alternatîfa vî aştiyane ango bi awayekî aştiyane û demokratîk çareser kirina gelşa kurd e. Her wiha vegere gundan e. Îro ger Projeya Gundebajaran pêk bê jî, ne mimkûn e ku gundî vegerin. Hetanî ku pirsgirêka koçberiyê neyê çareser kirin, li Tirkiyeyê gaveke demokratîk nayê avêtin. Divê rojek berî rojekê dewlet hemû pêdiviyên koçberan peyda bike. Ger mafên koçberan lê nayên vegerandin, dê Tirkiye li Ewropayê têkeve tengasiyê mezîn

Li ser bîngê piştgiriyê bi partî û saziyan re tîkiliyên we hene?

■ Em ligel piştgiriyê kincan, bo perwerdeyê jî pirtûkan peyda dikin. Me par bi vebûna dibistanan re bi alîkariya Egitim-Senê jî nêzîkî 12 hezar pirtûk û alavên perwerdeyê yê din peyda kirin. Par xwendekaran bi serbestî pirtûk peyda dikirin. Lê îsal dibistan pirtûkan tespît dikin. Lewre jî em her pirtûkên ku bo alîkariyê hatine, nikarin bidin lêqewmîyên koçberiyê.

HEVPEYVÎN: M. SERHEDÎ-Ş. SEFER

Qerisîn li ser lêvên Amedê kenên kevokî

Gûstêrk

Wek zivistanek gur û har hat bêwext
12'ê rezbera 1980'yî
hê zernebûyî çilmisîn
hişk bûn û ketin
kûlîk û pelgên evînê.
Qerisîn li ser lêvên Amedê kenên kevokî
dayikan reş girêdan li dor stranan
di gewriya ciwanan de man
hemû gotinên ji bo pêşerojê
û welat gevizî di nav xwinê de
niha xwezî tîne bi salên buhurî
û çavên hevîyê
bi nexweşiya miyopê ketiye
û mirovahî
hezkirin
dinale
di bin potînen
gurebozên koçber ên havînên
Asya de
û em
li mala xwe, li ser xaka xwe
kirin qaçax, eşqiya
û pêlên şabûnê
li peravên biyanistanê dixê edî
lê
bi çirûskên agirê Mazlûm
jiyanê aj da ji nû ve
ji nû ve me hev nasî û
me ji hev bêhtir hez kir
û wek rehên çinarekê
dara berxwedanê bilind kir
û em niha bi hezaran gûstêrk
in
ji bo têkoşîna azadiyê.

BERKEN BEREH

Meberme Markîg

Yeno to vîr
Yeno to vîr Markîga qaspe ku-
ho
çend roj ravêrdî
çend mang
û
Çend ser
Yeno to vîr
E xortên to yê ciwanmêrd
E yê ke to
Bi şitê qaspe ya xo warî kerdîbî
Ya nameyê îna
To çi raw xo vîra kerdî
Markîga çim siya
porsûr
û
Çina zerd
Gama çareyê xo
To dabî Koyê Nemrûd
Çimên to jew weniya yê helbilos
E bîni jî weniya yê Axşûn
û çatok
û to destên xo jî
dergî robarî Ferat kerdîbî
kamcîn roj bî a roj!
Yeno to vîr?

Ya demser?
Di qeçekî bîbî di taxê corin de
Kewtibî to pês
Jew lajek
Jew keynek
Nameyê îna xo pira kerbî
To vatbî keynek Dilan
Lajek jî dewran
Bermayîşa îna xo verdabî
Fekê dolo siya
Ame to vîr Markîg
A roj
Roja panc ronakrewanan
A roj û nata
Bî çend ser
Ame to vîr Markîg

Bişû qespeya xo ya kuho
Bi goniya şehîdan
Bi qespeya xo ya veşiyayî
Veng bidî Dilan
Vaci ci rê:
Mizgîna min li to
Jew bî sey
Sey bî sey hezar
Xo xemilyano
Bi tiving
bombe
û fişekan
sond werdo ey
Odo werzanê heyfê şehîdan
vaci
mizgîna min li to Dilan

Berf reş dibe, li ser cemedê
Yek car bihemd, yek car bêhemd
Diponijim sibe nabe

Dîwar neynik e, çav kor e
Xew birîndar e, dem şûr e
Hilm agir e, term tenûr e
Diponijim sibe nabe

Tarî pez e, şev şivan e
Tajan tîr e, dil kovan e
Derûdor Beko Evan e
Diponijim sibe nabe

Êş naxir e, zik axo ye
Dev afîr e, alif xwê ye

Xwarin para xwin û xû ye
Diponijim sibe nabe

Zilm necar e, xof tefşo ye
Av ji xwe mîna avşoyê
Nan minakiya pişoyê
Diponijim sibe nabe

Titûn sergîn e, dû ba ye
Dev kadîn e, xwarin ka ye
Qirik rojing, mij hêwa ye
Diponijim sibe nabe

înan mertal e, vîn şûr e
Hêvî hingiv, evîn şîr e
Name hêz e, pênûs tîr e
Diponijim sibe nabe

Pidî birîn, didan ko ye
Jana do, ji îro no ye
Çi dikim xewa min nayê
Diponijim sibe nabe

Aştî şer e, şer tevger e
Raman tac e, wêrîn zêr e

Qed ribayê, hay bêder e
Diponijim sibe nabe


Zilm marê birîndar e
Bi roj dîn e, bi şev har e
Ji çavê wê ar dibare
Diponijim sibe nabe

Tunebûn arê bêdû ye
Hebûn mîna bûka nû ye
Navbera van, pira mû ye
Diponijim sibe nabe

Şev ji şev bêhtir erjeng e
Roj ji roj zêdetir teng e
Bijang hesinên bi zeng e
Diponijim sibe nabe

Roj kevîr in, sal bargîr in
Çiya dûr in, dîwar ker in
Yên di bin van de gişt KARKER in
Diponijim sibe nabe

İLHAMİ ÖZER



Karê bêbextan
û
Vengê xoverdayîşa şehîdan
Pirr kerdîbî qaspeya Kurdistan
Kotî dê ewroj
Dilan
û
Dewran
Ez jî geyrana
zeydê to
nêzana cayê îna
A roj
Bî rûpelên altûnî
û kewt dîroka Kurdistan
bes o edî meberme
Ame to vîr
Tu qandê çiçî bermana
Bi seran Markîg
Werze xo ser
Çimanê xo ziwa kî
Hêstirên çimê to
Qespeya to jî leymin kerd markîg

Oyo ameyo dewran
Veng bidî ci Markîg
Markîga qespe kuho
por şûr
çina zerd
mizgîn bidî Dilan

ZÜLFİKAR TAK

Azadiya zuha

Gora min ji mermerê penaberîstan
û kafenê min metroyek ji gola tenêtiyê
di qozîkek oda xwe ya biçûk de
li ser hevala xwe masê
azadiyeke zuha didoşim piyala temenê
xwe
her sibe dihingivimê
û sêla dilê xwe -a sor-
bi sê niqîtk azadiya zuha şil dikim

H. KOVAN BAQÎ

Ameda bêsiibe

Pir bêbext e Hepsa Amedê

Li Navenda Çanda Alternatîfê

● 19.09.1998 şemf

Konsera Koma Agirê Jiyana saet:15.00

● 20.09.1998 yekşem

Konsera Grup Son Anka saet:15.00

Konsera Koma Gulên Xerzan Saet:17.00

● 25.09.1998 in

Fîlm: Ew jî dayîkek e

Derhêner: Teryy George



Li NÇM'a İzmirê

● 19.09.1998 şemf:

Konsera Koma Jiyana Welat saet:18.00

● 20.09.1998 yekşem:

Konsera Koma Varoş saet:17.00

● 19.09.98:

Li HADEP'a BAĞcılarê ji aliyê Înstîtuya Kurdî ve bi navê "Jiyana Apê Musa û Têkoşîna wî" programek tê lidarxistin. Saet: 15.00-20.00

Azadiya Welat şeva hevnasînê li dar xist

Her tişt kurdewarî bû



"Ji bo jiyaneke nuh." Heft sal berî niha an jî di 22'ê reşemîya 1992'yan de Rojnameya Welat bi vî semavî derketibû pêşberî dilsoz û dilxwazên ziman û çanda kurdî. Bi rastî jî ew roj ji bo ziman û çanda kurdî roja raperîna mezin bû. Gelê kurd bi çavên serê xwe bawer nedikir, dilgeşîya wî di dilê wî hilnedihat.

Serokwezîrê dewleta tirk ê wê demê Turgut Özal wiha digot: "Ma kurdî bê serbestkirin kurdî lê xwedî demakevin, dê bi rengêkî jixweber ji navê rabe." Belê derçûna Rojnameya Welat wekî bayê brûskê li van helwest û nêzîktêdayînên mêtîngeran ket. Ev feraset û bawerîya çewt û bêbingeh ji binî ve têk bir.

Wekî ku tê zanîn piştî Welat, Welatê Me dest bi weşana xwe kir. Belê ev kevneşopîya pîroz bêrawestî digel hemû gelê û astengan îro bi meş û bezeke mezin bi navê Azadiya Welat rûdanên li Kurdistanê û cihanê bi kurdî, bi rengêkî kurdewarî dişopîne.

Ev kevneşopîya ku bi navê Azadiya Welat di rîya xwe de dimeşe, ev çend meh in, wekî lehiya biharê bi geşedanî xwe li qeraxên Anatolî û Kurdistanê dixê. Azadiya Welat piştî ku li Îzmîr û Mersînê tovên kurdewariyê çandin, li dilê kurdan yanî li Amedê jî nûnergeha xwe vekir.

Ji ber van hemû pêşveçûnan Azadiya Welat ji bo ku xebatkarên wê baştir hev binasin û her kes dilgeşî û coşa xwe der bibe, li Navenda Çanda Alternatîfê pîrozbahiyek li dar xist. Di çalakiyê de ligel xebatkarên Azadiya Welat ên navenda giştî, Amed, Îzmîr û Mersînê, xebatkar û rêveberên Kovara Jiyana Rewşen, Teatra Jiyana Nû û Înstîtuya Kurdî beşdar bûn.

Di pîrozbahiyê de Gerîndeyê Giştî yê Aza-

diya Welat Sami Tan, jî NÇM'ê Murat Batği, jî Jiyana Rewşen Esmâ Eksen, Serokê Înstîtuya Kurdî Hasan Kaya, nûnerên Azadiya Welat ên Mersîn, Îzmîr û Amedê bi axaftinên xwe dîtî û heştên xwe yê der barê pêşketinê dawî de anîn zimên û serpehatiyên xwe der birin.

Gerîndeyê Giştî yê Azadiya Welat Sami Tan di axaftina xwe de bal kişand ser girîngiya çalakiyê û asta xebata Azadiya Welat. Tan got: "Rast e, li gorî berê gavên baş hatine avêtin, lê dema mirov pêwîstiyên şoreşê bide ber çavan, ev gaveke gelekî biçûk e. Lewre jî divê xebat gurtir bibin." Serokê Înstîtuya Kurdî ya Stenbolê û nivîskarê rojnameyê Hasan Kaya jî diyar kir ku Azadiya Welat di nava çapemeniya kurd de xwediyê cihekî taybet e, lewre xebata wê zêdetir ji bo dil e.

Piştî van li ser navê NÇM'ê Murat Batği peyivî. Ev gotinên Murat Batği gelekî balkêş û wêdar bûn: "Welat bo me ne tenê rojnameyek e, her wiha dibistanek e, namûsa me ye. Li Welatê xwedîderketin, parastina namûsa kurdan e, hemû sazî bo me girîng in, lê welat di warê xwe de ji hemûyan girîngtir e."

Di vê lihevkomîna kurdewarî de yek ji cûdatiyên ji çalakiyên din jî bi kurdîbûna danîna tîkiliyan û axaftinan bû.


Di pîrozbahiyê de Koma Agirê Jiyana bi stranên xwe ev şadî û coşî gurtir kir û dilan hate gerandin. Hozan Zulfikar jî bi saz û awaza xwe bi zaravayê kîrmanckî piştigirîya xwe nîşan da. Her wiha xwendina helbestan ji aliyê xebatkarên rojnameyê û mêvanan ve şevbûhêrk geştir kir.

Şeva Hevnasîna Azadiya Welat bi axaftina girtinê bi dawî bû.

A. WELAT/STENBOL

TÎŞK

Zonê dayikê û musayena dê



LERZAN JANDÎL

Se ke êno zanayene doman ya zonê dayika xo çê xo de, maya xo ra, piyê xo ra, bira û wayenê xo ra museno, ke prosesêde normal o, yan jî mekteban de museno. Eke doman zonê dayika xo çê xo de nêmuso, ma vacîme ma û pî bi xo nê zonî qesê nêkenê yan jî nêzanê, şîkîno nê zonî mekteban de bimuso.

Rind! Doman mekteban de zonê dayika xo se museno. Verê her çî ganî no zon mekteban de bêro musnayene. Seba naye jî ganî bi nê zonî, seba musayen û musnayena nê zonî materiyalî bibê.

Eke dewleta ma jî niya ro. Dewleta dînan çîna. Bar zanayan, ma û piyan ser ro mendo. La belê ê jî wayirê nê barî nêvecînê. Ma naye rindêrî zarava ma de yane kîrmanckî de vînenîme.

Ya ma û piyî bi xo zarava xo qesê nêkenê, çimke qedr nêdanê ci. Ya bi xo nêzanê. Yan jî wazene, ke domanê dînan zonê dînan bimuse, la belê seba musayena dînan nêxebetîne, karê xo nêkenê.

Se ke êno zanayene, teberê welatî de, tayê welatanê Ewropa de, îmkane zonê xo musayene seba domananê ma esta. Bêre niyadêre ke ma na îmkane se xebetnenîm!

Peyniya hefteyê verênî de şarîstane Almanya Aachen de seba zonê dayike yew kombiyene amê viraştene û M. Çem seba na kombiyene amê bî silaynayene. Verê şiyena xo M. Çem amê lewê mi û mi ra pirtûkê ke seba domanan amê viraştene persa.

Ebi zarava ma pirtûkê domanan estê? Çand heb ê? Se doz benê, ênê diyene? Kamî nivisnê û yan jî kamî çap kerdê?

Çî hêf ke na derheq de zarava ma zaf qels menda. Yanê zarava ma de seba domanan zaf çî nêyamê kerdene. Yê ke mi doz kerdê, kewtê mi dest 10 heb ê! Çiqa şermêde giran o. Seba amayena xo, seba estbiyena xo, yanê seba domananê xo ma hetanî nika teyna 10 pirtûkî viraştê!

Eke bêro vîndero, gelê kesî xo kîrmanckî hesabneno. Dorê nêdano kesî. Serde jî dest ra kar êno. La belê bi zonê ma nê, ya bi tirkî ya zonêde yan jî zaravêde bîne pirtûkan nivisnê.

Tayê kesî jî karanê lerza/acil nêkenê, la belê karanê pratîkan ê jî bi mantiqêde pragmatîk kenê. Ne ke ma nê kara kij vînenîme. Nê, na mezgê ma ra derbaz nêben. La belê ganî mordem kêmasiyanê ma jî bivîno, ke nînan werte ra wedaro, seba daye kar bikero.

Ewro ganî her kes, her pedegog, mamoste karê pirtûkanê musayen û musnayena zonî xo rê bikero gure. Her hozan ganî viraştene kilamanê domanan xo rê bikero kar. Her nivîsnayena şanikanê, hêkayetanê domanan xo rê bikero kar.

Eke ma na kerde, ma şîkînîme zonê xo bimusunîme domananê xo, domanê ma şîkînê zonê xo bimuse. Bi na qeyde jî wayirê kesîtiya xo bê!

Filîtê Quto

(2)

Mamê Eliyê Etman bala xwe didê ku li ser pira Batmanê yek sekîni ye. Mamê Elî bang dikê:

– Xorto tu kî yî? Û tu çi teva yî?

Îcar Filît lê vedigirîne dibêje:

– Mamê Elî Emankî, ji min re dibên Filîtê Quto kurê Şemê. Û ez sekinîme li ser pira Batmanê. Ezê vêsê ji we bistînim ruşwet û baca rêyo.

Mamê Elî bang dikê:

– Filîtê Quto kurê Şemê lawo heke tu feqîr î bigire serê qantira pêşî. Navê wê Xeco ye. Binbarê wê xurme ye û serbarê wê malê Bexdayê ye. Ji xwe re bi serê wê bigire û bibe. Bibe mesref û tesediqa serê karwan û di riya xaliqê alemê. Ez didim te helal û xweş be li te. Weke şîrê dayika te.

Filît bang dîke Mamê Eliyê Etman:

– Ma ez ne feqîrekekî ez bibim qantirekî. Di nava vî karwanê te de çavê min li tiştêkî te ye.

Mam Dibêje:

– Ew çi ye?

Filît dibê:

– Ew desthilanîka milê te yê çepê ye.

Mamê Elî dîsa bang Filît dîke:

– Filît lawo dilê min dibêyo. Kesî tu carî ji karwanê mala Mamê Elî nesitandiye baca rêyo. Û tu car mala Mamê Elî nesitandiye baca rêyo. Û tu car mala Mamê Elî baca rê nedaye tu mehkûm û qaçaxçî û pêxwasayo. Lawo de tu tesed kum û qaçaxçî û pexember, tê ji xwe re qantirekê bikşîni ji pêşiyê û yekê bikşîni ji ortê. Belkî te jin ji xwe re xwestibe û qelenê te mabe li erdê û bira bela û qetl û qutûl çênebe li ser pira Batmanê. Çavê erz û eyalê me li rê ye.

Filît dîsa bang dîke dibê:

Mamê Eliyê Etman lawo dilê min dibê, peyva temam ji mêrikê ehmeq re ye li darê dinê. Min berê ji te re gotiye di nava vî karwanî de çavê min li desthilanîka milê te yî çepê ye.

Mamê Elî bang dîke:

– Filît lawo dilê min dibê ye. Ji xwe re qantirekê bigire ji pêşiyê ye. Û yekê bikşîne ji ortê ye, û yekê bikşîne ji dawiyê ye. Hersê bar, serbar xurme ye binbar malê Bexdayê ye. Bifiroşe ji xwe re, pê bixwaze jinekê ye û min jî dawet bike wexta ku ez bêm daweta te ezê desthilanîka milê xweyî çepê bikim xelata te û ez ê bidim te. Ezê wê çaxê bidim te bikim xeleta te. Bira meraqa wê bi te re nemîne li darê dinê ye û bira ji min û te re bibe şerefa dinê ye.

Filît napejirîne. Û bang mamê Eliyê Etman dîke dibêje:

Lawo Mamê Eliyê Etman, lawo kurê

kerê ma çîma tu peyvê fêm nakî li vê derê? Ez ne hatime pêşiya karwanê te destê xwe venakim û nakim parsekiyê. Ez ji te dixwazim desthilanîka milê te yî çepê bi destê zorê.

Mamê Elî dîke û nake Filît razî nabe. Û dilê Filît di xerebiyê de heye. Mamê Elî bang dîke, mamê Xerzî digot:

– Tu bavê min bî hela tu jî dawiya karwan were heta pêşiyê, bê ez ji te re çî dibêm!

yo. Ez bi ehedê mehed dikim, min hîna gulê pê neavêtiye li darê dinê ye. Dêmekî misteheqekî wekî te ew ê fitara wê veke li canê xwe ye.

Mamê Elî cara dawiyê jî bang dîke Filîtê Quto:

– Filîtê lawo ez ketim bestê te û xaliqê rebê alemê yo tê qebûl bikî, bikşîni qantirekî ji pêşiyê û yekî ji navê û yekî ji dawiyê ye. Tê ji xwe re bikî mesref û tê ji xwe re jinekê bixwazî. Qelenê te jî ez ê



Mamê Xerzî tê hinda mamê Elî, dibêje:

– Te xêr e û te çu dibê?

Mamê Elî dibêje:

– Tu bavê min bî tê barê gulîsora bi-qelîbîni û têkevî berê. Ev Filîtê Quto tu pela naxwîne û tu peyvan fam nake li vê derê. Bira di orta min û wî şahid de be xaliqê alemê. Ezê wî bê can bihêlim li ser pira Batmanê.

Mamê Elî bang Filîtê Quto dîke:

– Filît lawo wezê bi tapiya bavê Bro. Dara Silagosim ketim wa bi rê ye. Desthilanîka milê minî çepê erêkirina xokên te yî xoxê û Eynê ye. Û qelenê dayika te Şemikê ye. Ma ji sibehîna Xwedê de ez ji te distînim riya mala Xwedê çîma tu fam nakî li vê derê ye. Desthilanîka milê minî çepê ev meheke min kiriyê ji Bexdayê

bidim. Û di peyra ez ê li dawetê nav êşîra xwe ez ê gedekî êşîrê têxim dawa te. Emê deynin kirîbantiyê. Ez ê wê çaxê bidim te desthilanîka milê xweyî çepê ye. Bira miraqa wê bi te re nere gorê ye.

Filît bang dikê, dibê:

Lawo, Mamê Elî lawo kurê kerê. Çîma ez dikim û nakim tu peyvê fam nakî li vê derê û pîrsa pêşiya ye, dibê peyva temam ji mêrikê ehmeq re ye li darê dinê ye. Min berê ji te re gotiye di nava vî karwanê te de çavê min li desthilanîka milê te yî çepê ye.

Mamê Elî barê gulîsoran diqelîbîne û bang Filîtê Quto dîke dibêje:

Filîtê Quto lawo, were emê di navbeyna xwe de deynin şertên mêranîyê.

Filît dibêje:

– Şertê te çi ye?

Mamê Elî dibêje:

– Şertê min ev e, ez û tu em ê kazîkê xwe çêkin. E û tu emê bi dor bi dor berhev û din bidin. Ji bona ku kesekî din di rûyê me de neyê kuştin û li telefatê nekeve.

Filît jî dipejirîne. Her kes ji xwe re kozîkê çêdike. Filît dibêje:

– Tu berê bera min de.

Mamê Elî dibêje:

– Na tu berê bera min de.

Û Filît ji mamê Elî re dibêje:

– Tu serê xwe bi qandî perçeyek nan di serê kozîkê re ji min re derxe.

Mamê Elî fenek bû. Kum û kolozê xwe ji serê xwe derdixe û li ser kozîkê datîne. Ji bo ku Filît bibêje wa serê wî xuya ye û Filît bera didê. Kum û kolozê wî difirîne. Filît dibê qey min kuşt. Û bala xwe didê ku Mamê Elî ji hundirê kozîkê rabû ser xwe û bang Filîtê Quto kir got:

– Îcar dora min e.

Filît ecêb mayî ma û fam kir ku Mamê Elî fen lê kir. Filît bang Mamê Elî kir:

– Lawo, bexê min te fen li min kir.

Û îcar Filît serê xwe di ser kozîkê re derdixe. Mamê Elî bera didê û qalpaxa serê Filît difirîne. Şemê, dayika Filît bala xwe didê karwanê mala Mamê Elî derbas bûn û cenazeyê Filît ma li wê derê û li ser cenazeyê Filît disekine û dibêje:

– Filîtê mino lawo min kir û nekîr te bi ya dayika xwe nekîr. Û mala Mamê Eliyê Etman serê kurê min ji cendekê wî kir û te cegera dayika xwe dax kir. Û te dergistiya xwe di mala bavê de stûxwar kir û te ji cem dayika xwe bar kir. Te çû koça xwe li cem koça bavê xwe li dar kir û te ji cem dayika xwe bar kir. Û te dilê dayika xwe ji dinyayê sar kir. (Qediya)

Hejmara 23'yemîn a Jiyana Rewşen derket

Kovara wêjeyî, çandî û hunerî ya bi kurdî Jiyana Rewşen bi hejmara xwe ya 23'an derket pêşberî xwendevanên xwe. Di pêşgotina Jiyana Rewşen de bi piranî li ser bersûc, şahîd û dozdarê vê dewletê Apê Mûsa hatiye rawestandî. Wekî din ji bo salvegera mirina Yilmaz Güney nivîsek heye. Nivîsa Feqî Huseyn li ser jînenîgariya "Şêx Mehmet Can" bi awayekî dorfirehî sekiniye û çend beytên wî pêşkeş kirin. Nivîskar Medenî Ferho bi navê "Huner û Jiyana Civa-kî" nivîseke wêjeyî amade kiriye û li ser tevgera civakê bandora hunerê nixandiye. Û di cihekî nivîsa xwe de dibêje: "Guhartina civakî bêyî rewşenbîran kêm e, qels e, lawaz e, bêreng e, bêxeml e, bêxwê û bêrûn e". Rast e. Lê di wê tevgera azadîxwaz de, ji bo vê guhartina civakî ew rewşenbîr û ronakbîrên me çiqas rola xwe tînin cih, ew jî mijara nîqaşeke din e.

Çiroka Amed Mahsum a bi navê "Çûyîn an jî mirin" bi rastî tahmeke helbestî dide. Gava mirov wê nivîsê dixwîne, xwe di nav gelek bûyer û daxwazên ku di wê çîrokê de hatine ziman de dibîne û dijî. Nakokiya ku kurd îro rasterast dijîn xwe di vê çîrokê de baş diyar

dike. Di çîrokê de xortek ji ber zilma dewletê mecbûr dimîne ji welatê xwe vediqete û ji bo demeke kurt diçe welatê xerîbiye, welatê belengaziyê, welatê zilmê. Lê di rêwîtiyê de li mirovê kî rast tê û di navbera wan de hevnasîna pêk tê. Ev mirov hîn dibe ku ew jî ji ber dijmin direve. Paşê jê re dibêje:

"Tu ji ber destê dijmin direvî û diçî nava dilê dijmin. Ev çî dest e, ev çî dil e? Çawa dibe? Ev reveke çawa ye? Yanî tv hem jê direvî, hem nêzikî wî dibî! Gelo ev dibe? Hem dixwazî jê bi dûr bike-

vî, hem jî ber bi hundirê wî ve dibezî! Kîjan rev, kîjan nêzikbûn? Her tişt xwe ji nû ve diafirîne, wateya her tiştî diguhere, yan em wî ha fêm dikin".

Wekî din çiroka Xalit Temelî ya bi navê "Me Ji Berbangan Bipersin" e. Çîrok a Bavê Hêmin a ku bi navê "Rûpelin Ji Pêlikên Dîmokratîyê" piranî li ser xwendekarên zanîngehên Başûrê Biçûk û li ser serpêhatiyên wan sekiniye. Çiroka "Strana Sirme Xanê" ji hêla Sertîp Mansurî ve hatiye berhevkerin di

kovara Sirwe de hatiye weşandin. Her wiha beşa sêyemîn a nivîsa bi navê "Rexne û Teoriyên Wêjeyî" ya ku H. Kovan Baqî ji tirkî bo kurdî wergerandiye, di vê hejmarê de cih girtiye. Di vê nivîsê de nerîna Platon a li ser rîsta wêjeyê û nerîna şagirtê Platon, Arîstoteles heye. Kawa Nemir li ser çend destnanên mîtolojiya Mezopotamyayê disekine û bi navê "Destpêkek Ji Bo Mîtolojiya Mezopotamyayê" nivîsiye.

Wekî din jî di vê hejmara Jiyana Rewşen de ev nivîs û helbest hene: Ji Bo Kurdên Bîndest-Kawa Nemir, Kelawaca-Xîretê Ayhan Bekirxan, Ayetên Çiyê-Xemgînê Remo, Lorî Delaliya Zorwan-Emin Ali Bedirxan, Hestên Tengezar-Nihat Çelik, Pêlên Zeryaya Dilê Min-Nesim Kasirga, Jan û Can Dost Çiyayî, li Kurdistanê Leqeb-Yaqûb Tilermenî, Hesteta Dil-Berhîm Paşa, Xwarina Xweş-Bro Ömerî.


Her çiqas Jiyana Rewşen wekî kovareke wêjeyî û hunerî be jî mirov dikare bibêje ji hêla naverokê ve ne têr û tijî ye. Divê ji bo çand û hunera kurdî hîn bêtir bi baldarî li ser bê sekinandin.

ŞÊXMÛS SEFER



Kurd û pisqilêt?

OSMAN ÖZÇELİK



"Kurd û pisqilêt? Gîder walî begin erebesine çarpar." Pisqilêt (duçerxe) nû hatiye Kurdistanê. Kurdek dilbijokiyane dîke û diçe ji xwe re yekê dikire. Feqîro nizane bajo. Ha-ha, ha-ha pisqilêt li ser piyan, ew jî li ser pisqilêtê diedîle û bi rê dîkeve. Tu nabê taksiya waliyê bajêr ji wê de tê. Ajoivanê pisqilêtê şaş dibe û li taksiyê dixê. Gava li nezaretxaneyê polîs bi ser hişê xwe ve tê, ji lêdanê her derên wî jan didin.

Pisqilêt sembola teknolojiyê ye. Kurd jî gundî, nezan û hejar in. Bajari qerfan bi gundiyan dikin "Kurd û pisqilêt?" Dagirkeran kurd ewqas biçûk û kêr kirine ku êdî, kurdan bi xwe jî bawer kiriye ku ew; nezan, bêhiş, tiral û xayin in. Heta kurd ne însan in. Li gorî kurdan kurd, hem dar in û hem jî kurm in. Sedemê dara riziyayî jî ev e.

Li navenda bajarên kurdan asimilasyon kevntir û diwartir bûye. Kurdên li naven-

da bajarên zûtir ziman û çanda xwe wînda kirine, kurdên li navçeyan û li gundan pirtir xwe parastine, ziman û çanda xwe wînda nekirine. Bi propogandaya dewletê nakokiyên navbera bajariyan û gundiyan kûrtir bûne.

Li navenda gelek bajarên kurdan erêb û ermenî hebûne û paşê hinek malbatên tirkan jî li bajarên kurdan hatine bicihkirin. Bajariyan xwe tirk, gundiyan jî xwe kurd hesibandine. Karmendên dewletê, bazirgan û senetkar jî bajariyan bûne.

Kurdên gundî, jî destê bajariyên Erziromê yê dadaş, bajariyên Mêrdîn û Sêrtê yê erêb, bajariyên Amed, Wan û Bilsê yê tirk û kurd gelek kişandine. Kurdên gundî her car xwe li hemberî bajariyan kêr û biçûk dîtine. Dagirkeran kurd, jî reh û ziravê wan qetandiye. Heke kurdan hay ji dîroka xwe hebûya; Ehmedê Xanî, Melayê Cizîrî, Seleheddînê Eyûbî nas bikirina, qet xwe kêr nedîdit û heqaret qebûl nedikir. Ger kurdan hay ji dîroka xwe ya pênc hezar salan a li Mezra Botan hebûya, ji ku wê mezinatiya hov û êrîşkaran qebûl bikirina.

Belê, spas ji yezdan re ku îro kurd, bi dû kesatiya xwe ya neteweyî ketine û

nema xwe kêr dibînin. Bajariyên bajarên kurdan cihê xwe dane kurdan. Hejmara kurdan, li her bajarên kurdan zehfîr bûye. Êdî kurd, ji teknolojiyê natirsîn, teknolojiyê nas dikin û bi kar tînin. Bi hezaran muhendîs, bijîşk, mamoste, dadmend û teknîkerên me hene. Kurd êdî balafir û trênan diajon. Bikaranîna faks, kompîtur, telefon û internetê ji kurdan re bûye mîna vexwarina firek av.

Ya girîngtir jî, êdî kurdan rêxistinên xwe yê serbixwe ava kirine û doza îdarekirina xwe dikin. Di meha tebaxê de kongreyên HADEP'ê yê bajarên li dar ketin. Bi hezaran, bi deh hezaran kes beşdar bûn. Mêr, jin û zarokên kurdan bi çêşeke mezin çûn kongreyan, zarokên wan 7-8 salî di salonên kongreyan de bi hevdu re dilîstin û hîn dibûn. Hînî jiyaneke nû, jiyaneke civakê ya nûjen dibûn. Gava serokên kongreyan ji bo dengdana vekirî ji nûneran dipirsîn, digot: "Yên qebûl dîke bila destê xwe hilde!" Zarokên me giştikan bi nûneran re destê xwe hildidan. Desthildana zarokên me, ji bo jiyaneke azad û serfiraz bû. Paşê dewletê hatina zarokan a kongreyan qedexa kir.... wan fêm kir ku ji bo pêşerojê qirnekî çawa radibe.

Radyo

Li çiyayên we jî govend hene

Wexta ku radyo nû derketibûn, yekî Gimgimî ku navê wî Behrî bûye radyoyekê dikire û dibê mal. Roja pêşî her du zarokên wî ji berbangê heta esrê lê guhdarî dikin. Bêhna Behrî teng dibê. Dipekîne ser zarokan:

– Bes êdî, Xwedayê we heye, qapat bikin bila ew camêr jî biçin nan bixwin, a niha ji birçîna mirine.

Rûnê xenzîr

Yekî Înaqî ku bi temakarî navdar e ji Almanyayê vedigere. Li Gimgimê nanek firinê dikire û diçe gund. Dilê Hecî diçe nên dibêje: ka perçeyek nan?

Emer (zilam): Hecî, rûnê xenzîr tê de heye. Ma

te nedîtiye çawa sor bûye.

Ûçax

Li gundê Kêrsê êvarekê, yek diqîre: “Ûçax ket, ûçax keet...!”

Bi qîrînê re her kes ber bi mêrik ve dibêze. Yek dipirse:

– Malikava, ka te got, ûçax ket?

– Kuro navê kûçikê min ûçax e, ûçaxa min di dîwêr firî.

Pepooo

Çend kesên Kunavî diçin Mûşê. Ji wan yek li derdora xwe dizivire. Bi awayekî ecêbmayî ji hevalên xwe re dibêje:

– Pepooo, ezmanê Mûşê çiças mezin e!

CÎHAN ROJ



3M fî

Li Stenbolê li semta Yenibosnayê diaalogek di navbera du welatparêzên ku baş hevdu nas nakin de diqewime;

Ev her du welatparêz yek ji Meletiyê yek ji Meraşê ye. Dîalog di dema xwarina nîvro de diqewime. Mirovê Meraşî destê xwe dixê berîka xwe û kaseteke Ferhat Tunç dardixê û datîne ser teybê û her kesî guhdariya F.Tunç dike. F. Tunç di stranekê de dibêje: “Dağlarda düğün var haydi halaya (Li çiyayên dilan e govendê bigirin).

Li ser vê yekê kesê Meletî jî yê Meraşî re dibêje: Gelo li çiyayên we jî govend hene?

Ê Meraşî jî ber ku yê Meletî baş nas nake bersiveke wisandide: “Erê wele, her car jî hene, lê gelekî dixine toz û dûman lo.”

CEWDET QUŞMAN

BI XELAT... XAÇEPIRSA BI XELAT (138) XAÇEPIRSA

PEYVA VEŞARÎ

Wêne	Qarantî	Coşî, kefi	Tipa pêşîn	Klasik	Tipa piştî
Nişandan, pêşandan	Qertafek neyênî	Herdû dengdarên 'Şit'	Ciyê ku ka dikinê berepaşki	Dijberê çuyin	p'yê
7			Dirinde hov		
Kesê otoriter					Çak, bi quwet
Berepaşki dayik	6				
	sembola Oksijenê	Roşan, cejn		Güzin, no	
		Stran			
Artêşa Kurdistan			Çiyayekî Me		
Notayek berepaşki			Navçeya Trebzonê		
	Şamî Zarokê bê dê û bav			Çelik, Hesinê zexm	Tipa piştî P'yê
Mesrefa zêde					
Tipa berê û'yê			Kesê ne aqil	2	
5	Parkîtek	3	Herdû dengdarên 'Reş'	4	Roja çuyî
Jê baran dibare					
Pirsgirêk			Çemek li Misirê		
				Qertafa neyênî	

PEYVA VEŞARÎ

Wêne	Qarantî	Coşî, kefi	Tipa pêşîn	Klasik	Tipa piştî
Nişandan, pêşandan	Qertafek neyênî	Herdû dengdarên 'Şit'	Ciyê ku ka dikinê berepaşki	Dijberê çuyin	p'yê
7			Dirinde hov		
Kesê otoriter					Çak, bi quwet
Berepaşki dayik	6				
	sembola Oksijenê	Roşan, cejn		Güzin, no	
		Stran			
Artêşa Kurdistan			Çiyayekî Me		
Notayek berepaşki			Navçeya Trebzonê		
	Şamî Zarokê bê dê û bav			Çelik, Hesinê zexm	Tipa piştî P'yê
Mesrefa zêde					
Tipa berê û'yê			Kesê ne aqil	2	
5	Parkîtek	3	Herdû dengdarên 'Reş'	4	Roja çuyî
Jê baran dibare					
Pirsgirêk			Çemek li Misirê		
				Qertafa neyênî	

Bersiva Xaçepirsa 136'an

Xaçepirsa me bi xelat e. Di 15 rojan de çî bersiv bigihîjin destê me, em dê wan binirxînin û bi riya pişkê li 5 kesan belav bikin. Xelata hejmara me ya 138'an Kasete Koma Gulên Xerzan e.


Jêrenot:

Ji bo ku bersiva we bê nirxandin, divê hûn “Peyva Veşarî” di nava qutiyên li bin xaçepirsê de binivîsin û tevî navnîşana xwe ji me re bişînin.



Pênc kesên ku xelata hejmara 136'an pirtûka Înstîtuya Kurdî “Xani'den Platon'a iki demet çiçek” qezenç kirine ev in: Metin Aslan/Mêrdîn, Metin Çiftçi/Wan, Suna Çomak/İzmir, Süleyman Açay/Mêrdîn, Nasir Ünüştü/Mêrdîn

PEYVA VEŞARÎ



Vînayînê hetpar ê aştîwazan û raya giştî:

Wa goş bidiyo adirbirmayîn

Pêseramayin de Wekilê Serokê HADEP Bahattin Güneli arînê (kötülük) şerî ard vîrî û wina vat: "Adirbirmayînê PKK, mesala kurd, raya demokrasî û aştîya çareserkerdin de firsendo gird o. Na ray da HADEP dest ra çiçî bêro, HADEP hedre wa."



Adirbirmayino ke, PKK îlan kerd, di hefteyê xo peyd de ternay. La belê serdarê dewlet û artêşa tirk ra hewna veng çiniyo. Serdarê dewlet û artêşê adirbirmayin nêvînayin ra yenê û her roj operasyonê newey virazenê. Bi taybetî jî, cayê ke artêşa tirk verdê adirbirmayînî, nêwetayê nezdîdê ci ra, ravêrê, wijayan rê adirbirmayin ser, operasyonî virazenê û fina benê sebebê bermayînê mayan û seykur manayînê çeçekan (domanan). Serokê PKK Abdullah Öcalanî nê rewşî ser, jew programê MED-TV de bêveng manayînê dewleta tirk protesto kerd û vat: "Mayê heveyina bipawimî, eke veng

mevejiyo û operasyonî dewam bikirê, mayê jî adirbirmayînî biqedînim".

Kiştê bîn ra serdaranê xeylê dewletan, partiyan û şahşiyatanê namdaran jî eşkerakerdin viraşt û adirbirmayînê PKK qandê (serva) qedayîna şerî firsendo gird dî û wast ke dewleta tirk goş bido adirbirmayin.

14'ê meng de serdaranê Sinn Fein ra Mitchell Mclauqlinî eşkerakerdin viraşt û adirbirmayin ser kêfwêşîna partiya xo ard ziwan û wast ke, dewleta tirk rojê ravey goş bido adirbirmayînê PKK.

Bahattin Güneli: Qandê aştî gama gird

Adirbirmayînê PKK ser Tirkîye û Kurdistan de jî vengê aştî yo beno berz. Wekilê Serokê Giştî yê HADEP Bahattin Güneli 14'ê meng de Otelê Pera Palas de kombiyayînê çapemenî viraşt. Serdarê ÖDP Doğan Halis Cagenoyê Serokê DBP Yavuz Koçoğlu û xeylê serdarê komalan ê demokratîkan û roşnîkarî tewrê pêseramayînî bi û pêrin waşt ke dewlet jî adirbirmayin îlan bikiro û şer biqediyoyê. Pêseramayin de Wekilê Serokê HADEP Bahattin Güneli arînê

(kötülük) şerî ard vîrî û wina vat: "Adirbirmayînê PKK, mesala kurd, raya demokrasî û aştîya çareserkerdin de firsendo gird o. Na ray da HADEP dest ra çiçî bêro, HADEP hedre wa."

Pêyserameyîn de tewrbîyayoxanê bînan ji hewlîn û rindîna aştî ard ziwan û adirbirmayin raya şerî qedînayîn de gamê gird hesabnê.

Polîsan destûr nêda şahiya aştî

Fina o roj Platformê Aştîyê Okmeydanî qandê vengdayînê adirbirmayin û wastenanê aştî berzkerdin wast şahiya aştî virazo. La belê dewleta tirk nêvira-da veng û wastenê aştî berz bo.

Kiştê bîn ra rojnameyê Ülkede Gündemê 16'ê meng, adirbirmayînê PKK ser, vînayînê rêgîstînanê heremê şer, ê adirbirmayînî ser giroftîbî. Rojnamey vînayînê înan manşeta xo ra dabi. La belê dişmena aştî û birayîna şaran dewleta tirk a xeber sansûr kerdbî. Xebera rojnameyê Ülkede Gündemî de vînayîno hetbar (ortak) aştî bi û waziyabi ke şero ke 15 seriyo Kurdistan de dewam keno wa biqediyoyê. Rastî jî lazim o ke kes goş bido nê vînayînan. Çimki şerê lîminî (qîlêrin) de ziyane girdî iyê vînenê.

Coka jî wazenê şer biqediyoyê û kes

memiro. La belê êkê arînê şerî nêvînayin ra yenê û meyitanê eskeranê kişayan de faşîstî û dişmenîna birayîna şaran kenê, goşanê xo nê vengê aştî rê racenenê. Her roj benê sebebê bermayîna mayan û meyitanê neweyan. Nê kerdenan ra oyo ayseno ke veng û wastenê aştî no hewaye (şekil) ser nêkewno. Qandê serkewtinê wastenan lazim o veng gur bo. Qandê vengî gurkerdin jî karo girdo kewno mildê aştîwazan û raya giştîya demokrat. Her çiqas hetanî nika zey wasten veng nêvejiya û zor nêdiya dewleta tirk jî, lazim o niwa tepya aştîwazî û raya giştîya demokrat vengê xo yê aştî berz kiro û qandê goşdayînê adirbirmayînê PKK zor bido dewleta tirk.

HADEP'a hedrekarîna mîtingan kena

Xora vêşiyê şeran jî no hewayî qedayîyê. Nê rojanê peyinan de hedrekarîno winayîno Partiya Demokrasiya Şarî (HADEP) de vinyeno. La belê partiyan û komalanê demokratîkan de nêayseno. Serdarê HADEP'ê qandê goşdayînê adirbirmayînî û wastenanê aştîberzkerdin hedrekarîne mîtinganê aştî kenê. Goreyê vatena Serdaranê HADEP iyê hetanî ser dê meng xeylê cayan de mîtingê aştî virazê.

MEMED DREWŞ



Bahattin Güneli

Beyoğlu/İstanbul
TEL: (0 212)
251 79 37
FAX: 251 95 85

■ Gerinendeyê Giştî yê Weşanê
(Genel Yayın Yönetmeni)
SAMİ TAN
■ Berpirsê Karên Nivîsaran
(Yazı İşleri Müdürü)
M. SALİH TAŞKESEN

■ ÇAPXANE
Yeni Asya Matbaacılık A.Ş.
■ Yayın Koordinasyon:
Gündem Basın ve Yayıncılık San. Tic. Ltd. Şti.

■ BELAVKIRIN
BİRYAY Dağıtım
■ NÜNERİTİYEN ME
(Temsilciliklerimiz)
■ Amed:
Tel: 0 (412) 223 34 83

■ Mersin
Tel: 0 (324) 233 83 96
■ İzmir
Tel: 0 (232) 425 37 02
Munchen:

(Nünerê Giştî yê Ewrûpayê)
Mahmut Gergerli
Tel: 49 871 672 29
Fax: 49 871 670 815
■ Swisre:

Ihsan Kurt
Tel-fax
41 21 652 76 07

■ Hollanda:
S. A. Fewzi
Tel-Fax: 31 10 48 555 43

■ Suriye:
Jana Seyda
Helim Yüsiw

ROJNAMEYA HEFTEYÎ
(Haftalık Gazete)

■ Xwedî (İmtiyaz Sahibi)
M. NURİ KARAKOYUN

■ Yönetim Yeri:
İstiklal cad. Asmalı Mescit sok. 35/37 No:308

Rêwîtiya ber bi bajarên Anatoliyê

Xwediyên kar çawa têne serê sûka karkeran ewil dibêjin ka hûn ji ku ne? Dema em dibêjin em Sêrtî, Amedî an jî Şirnexî ne, dibêjin karê me tune. Ji bo peydakirina karkeran têne vir lê piştî ku hîn dibin em kurd in, êdî nizanin çawa xwe ji me xilas bikin, vêca dibêjin karê me tune.

Li Kurdistanê piştî şerê çekdarî ku pazdeh sal berî niha li welatê me dest pê kir zordarî û kotekiyên dijmin jî li ser gelê kurd gelekî zêde bûn. Gund hatin şewitandin û valakirin. Tu kes di van gundan de nemaye, gundên nehatine şewitandin jî an bi darê zorê kirine caş an jî berê wan dane metropolên Anatoliyê. Nahêlin ên mayîn jî herin zevî û dehlên xwe bixebitînin. Lewre ew bêçare dimînin.

Dema ku rewş wiha be gundî jî ji mecbûrî ji bo ku debara xwe bikin, berê xwe didin bajarên Anatoliyê. Piştî ku serma çêdibe sezona însaatan jî têdîqede, êdî kar peyda nabe. Ji lewre ew vedigerin welêt.

Di vê pêvajoyê de gelek pêkutî û zordarî dîsa li van karkeran bi gotineke din koleyên hemdem tê kirin. Rewşa wan a li metropolan ji ya welêt xerabtir dibe û perîşaniya wan xwe bê-tir dide pêş.

Li serê Sûka Ulusê

Dema ku peyva Sûka Ulusê tê bilêv-kirin gelek tiştên ne xweş tê bîra kesên ku haya wan ji wê heye. Yên ku haya wan jê tunebe dibêjin qey wekî hemû sûkên din cihê gerê û bazarê ye. Dema kesên ku haya wan ji vê derê tune ye ku serê sibê rîya wan pê dikeve, dibînin ku 5 hezar mirov li wir kom bûne. Ji mirovên der û dorê dipirsin ka bo çi ev însan li vir li hev kom bûne. Piştî ku bersivê digirin çawa tu mêhkutekî li serê wan bixî ji xewa giran hişyar dibin.

Bi berbangê re, karker ji xew radibin, bi lez berê xwe didin serê Sûka Ulusa Enqereyê. Li wir li hêviya qismetê xwe û zarokên xwe disekin da ku xwediyên kar û taşeron bîn û wan ji serê sûkê bibin kar. Dema ku xwediyên kar têne serê sûkê bi karkeran re baza-



Bazar Karkeran a Ulus

reke hişk dest pê dike. Di vê bazarê de qala yewmiye, heqê xwarina nîvro û heqê rê tê kirin. Piştî vê bazarê diçine ser kar. Yên ku kar peyda nekirine jî heta nîvro heta carna hetanî êvarê dimînin. Li serê sûkê carinan tiştên pir xerab jî derdikevin holê, li ser pereyan peyçûn çêdibin, însan datînine hev, heta her roj lihevxiştineke dedikeve. Dema ku xwediyên kar bo peydakirina karkeran bi erebeyên xwe têne serê sûkê hawirdora wan tijî karker dibe. Deh-bîst kes bi hev re bi wan re dipeyivin, wisa dibe ku xwediyên kar li hatina xwe poşman dibin. Lê belê mecbûr in, ji ber ku koletiya herî erzan li wir peyda dibe. Di her taxeke Enqereyê de bazareke karkeran a bi vî rengî heye. Dema ku ez hîni rewşa wan bûm, ez çûm cem wan, li ser rewşa ku tê de ne min bi wan re hevpeyvînek kir.

We li welêt çi kar dikir û dema ku hûn têne vir hûn çi karî dikin?

□ **Kerim:** Ez ji Sêrtê, ji navçeya Dihê me. Di sala 1988'an de em koçberî bajarê Antalyayê bûn. Em li wê derê se salan xebitîn. Rewşa me hetanî dawiya

93'yan baş nîn bû, me û gelê wê derê li hev nedikir. Pir nijadperest bûn, em li wir qebûl nedikirin. Me nekarî ku em li wir bisekinin lewre jî em hatin bajarê Ceyhanê. Piştî hingê me dîsa kar peyda nekir, îcar em çûn Tarsusê, dîsa em di bexçan de xebitîn.

Xwediyên kar cudahiyê dixine navbera we û kesên ji Anatoliyê hatine?

□ **Serwest:** Ez ji Cizîrê hatime vir. Em li vir dixebitîn lê belê rewşa me ya li vir pir xirab e. Xwediyên kar dema ku me ji bo kar dibin, dubendiyan dixine nav me. Jixwe wan em ji welatê me derxistine, dixwazin me ji vir jî dûr bixin.

□ **Hesen:** Ez ji Sêrtê me. Xwediyên kar çawa têne serê sûka karkeran ewil dibêjin ka hûn ji ku ne? Dema em dibêjin em Sêrtî, Amedî an jî Şirnexî ne, dibêjin karê me tune. Ji bo peydakirina karkeran têne vir lê piştî ku hîn dibin em kurd in, êdî nizanin çawa xwe ji me xilas bikin, vêca dibêjin karê me tune. Diçin li Çorumî, Yozgatî û Kayseriyan digerin. Bi vî awayî nijadperestiya xwe

didin der. Berî niha mehekê yekî hat hosteyekî sewaxê xwest, hoste peyda kir, lê piştî ku bihîst ku ew kurd e got nexwe kar tune. Piştê çû yekî Çorumî peyda kir.

Dema hûn êvarê ji kar vedigerin hûn li mal çi dikin, cihê hûn lê dimînin çawa ye?

□ **Serwest:** Niha li Enqereyê Taxa Îsmetpaşa heye. Em li wir dimînin, dema em lê dimînin xaniyên wê kevn in, berî 50-60 salî hatine çêkirin ji lewre xaniyên wê ne xweş in, pis in, nexweşî pir çêdibin. Însanên me yên ku haya wan ji dinyayê û ji welêt hebe êvaran rojname, kovar an jî pirtûkan dixwînin, yên ku nezan in diçin qehweyan zemanê xwe bi tewşê dibuhurînin.

Hinek kovar û rojnameyên ku derbarê rewşa welêt û şerê qirêj de agahiyan didin hene, hûn wan dixwînin an jî hûn dikarin peyda bikin?

□ **Arif:** Em her hefte Azadiya Welat û Ülkede Gündemê dixwînin lê em bi zehmetî peyda dikin, dema em ji bayyan Azadiya Welat dixwazin gelek ji wan dibêjin tune an hebe jî nadin me, kêmtînin. Hinek hevalên me hene, em ji wan re dibêjin: "Hûn Azadiya Welat dixwînin?", dibêjin: "Haya me ji rojnameke wiha tune." Me divê bi dest bê belavkirin, ger nûnergeheke we li vir vebe em dê gelekî kêfxweş bibin. Jixwe zimanê me hebûna me ye. Zimanê me bi pêş ve biçê wê şerê azadiyê jî pêş ve biçê, hingê em dê bigihîne azadiya xwe. Dema zimanê me bi pêş ve biçê, wê doza gelê me ji bi pêş ve biçê û em dê zûtir bigihîjin serfiraziyê.